AMADEYÎ

# WÊJEYA KURDÎ

# 2

# 2 Amadeyî Wêje

# AMADEKARÊN PIRTÛKÊ

**Komisyona Nûvejenkirina Pirtûkê:**

M. Şîrîn ÇETÎN, M. Mazlum TEKÎN

***Mîzanpaj:***

M. Bedredîn OY

**Ev pirtûk; ji aliyê Desteya Perwerde û Fêrkirinê ve,**


**weke pirtûka waneyê hatiye pejirandin.**

**Email: s.m.kurdi2014@gmail.com**

# 2 Amadeyî Wêje



# 2 Amadeyî Wêje



"Bêguman emê wêjeya demê Neolotîk pêkbînîn"
Rêber APO

# NAVEROK

**BEŞA- I** .......... **9**

WÊJE Û DIROKA WÊJEYÊ .......... 9

*WÊJE* .......... *10*

SÛDÊN WÊJEYÊ .......... 14

PEYWENDIYÊN DI NAVBERA DIROKA WEJEYÊ Û DIROKA GIŞTI DE .......... 17

WÊJE XEMLA JIYANA CIVAKÊ YE .......... 20

WÊJE Û CIVAK .......... 23

JI WÊJEYA GELÎ SÛD GIRTIN .......... 26

**BEŞA II.** .......... **30**

DI SEDSALA XIV'AN DE REWŞA WÊJEYA KURDÎ .......... 30

HELBESTA FÊQÊ TEYRAN .......... 33

JINAMEYA FEQÎYÊ TEYRAN (1307-1375Ê ZAYIN ) .......... 36

HELBESTA NAZDAR XATÛNA ŞÎRAZÎ .......... 40

JÎNAMEYA NAZDAR XATÛNA ŞÎRAZÎ .......... 41

HELBESTA MELAYÊ BATEYÎ .......... 43

JÎNAMEYA MELAYÊ BATEYÎ .......... 45

*1-Qafiya lewaz (Nîv qafiye)..........53*

HELBESTA YAY HEBİBIYEYA ŞAREZORÎ .......... 48

JÎNAMEYA YAY HEBIBEYA ŞAREZORÎ .......... 49

HELBESTA XATÛN DAYRAKA REZBAR .......... 51

JÎNAMEYA XATÛN DAYRAKA REZBAR .......... 53

*2- Qafiya Tam* .......... *54*

HELBESTA MELAYÊ CIZÎRÎ .......... 55

*DIL JI MIN BIR* .......... *55*

JÎNAMEYA MELAYÊ CIZIRÎ .......... 58

*3- Qafiya Dewlemend* .......... *60*

HELBESTA BEKIR BEGÊ ERZÎ .......... 61

JÎNAMEYA BEKIR BEGÊ ERZÎ .......... 62

*4- Qafiya Hevdeng* .......... *63*

JÎNAMEYA EHMEDÊ XANÎ .......... 65

*5- Qafiya TAÇ* .......... *72*

HELBESTA ŞEREFXAN BIDLÎSÎ .......... 73

JÎNAMEYA ŞEREFXAN BIDLÎSÎ .......... 75

BERXWEDANA WÊJEYA KURDÎ ........ 78
HELBESTA MELE MENSURÊ GILGAŞÎ ........ 80
JÎNAMEYA MELA MENSURÊ GILGAŞÎ ........ 81
HELBESTA NALÎ ........ 83
JÎNAMEYA NALÎ ........ 86
*SAZÛMANIYA QAFIYÊ ........ 87*
TÊKÎLIYÊN DI NAVBERA HERIKÎNA WÊJE Û HERIKÎNA HIZIRÊ DE ........ 89
KLASÎZM ........ 90
ROMANTIZM ........ 91
REALIZM ........ 92
PARNASÎZM ........ 93
NATURALIM ........ 95
SEMBOLÎZM ........ 95
DI WÊJEYA KURDÎ DE ROMANTÎZM Û SEMBOLÎZM ........ 97
HELBESTA SELÎM SILÊMAN ........ 98
JÎNAMEYA SELÎM SILÊMAN ........ 99
JÎNAMEYA MIRADXANÊ BEYAZÎDÎ ........ 101
HELBESTA MELE XELÎLÊ SÊRTÎ ........ 105
JINAMEYA MELE XELÎLÊ SÊRTÎ ........ 106
HELBESTA MÎR EHMEDÊ ZENGENE ........ 108
JÎNAMEYA MÎR EHMEDÊ ZENGENE ........ 110
HINEK DESPÊK JI WÊJEYA KURDÎ ........ 112
HELBESTA ŞÊX NUREDÎNÊ BIRÎFKANÎ ........ 113
JÎNAMEYA ŞÊX NUREDÎNÊ BIRÎFKANÎ ........ 115
HELBESTA ŞÊX HESENÊ HEKARÎ ........ 117
JÎNAMEYA ŞÊX HESENÊ HEKARÎ ........ 119
HELBESTA KURDÎ ........ 121
JÎNAMEYA KURDÎ (1809-1849) ........ 122

**BEŞA III ........ 124**

WÊJEYA CÎHANÊ ........ 124
HELBESTEK JI GULISTANA ŞÎRAZÎ ........ 125
SEEDÊ ŞÎRAZÎ ........ 126
FERABÎ ........ 128

# BEŞA- I

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Li gorî we wêje çiye?

a. We berhemek li ser wêjeya Kurdî hatî nivîsandin dîtiye? Pêşgotina berhemekî wiha bixwînin û di refê de bêjin.

## WÊJE Û DIROKA WÊJEYÊ




# 2 Amadeyî Wêje

## WÊJE





Wêje, xemla hemû zanista ne. Ger wêje nebe tu zanist bi awayek xweşik nayên têgihiştin.

Wêjeyîbûn; bûyerek çandî ya civakê ye. Gelek pîvanên jiyanê yên weke rastî, şaşî disa bisûd û bêsûd, xweşik û nexweşik, bi pîvanên zîhnîyetê yên ku mirov piştre qezenç dikin ve, girêdayî ye. Wêje exlaqê rast yê civakê ye. Rastiya civakê ji girêdanek exlaqî ya wêjeyê çêbûye. Ji ber ku wêje hestek yê hestyariyê ye.  Civaka hestyar, civaka pak bûyiye. Civak, di gewherê xwe de exlaqê hevseng ya wêjeyê ye. Ji ber ku di wêjeyê de ezezî nîne, exlaqê pak bûyî heye; kes, civak û mirovên hest, zanist û hûnerê xwe bi wêjeyê bixemilîne, li gel wî kesî û wê civakê xirabî, bêmafî, nexweşî û kirêtî peyda nabin. Ji ber ku di civaka xwezayî de, jinê hestek wiha daye raberkirin, bi xwezayî hûnerekê wêjeyê bikaraniye û bi vê hûnera xwe bûye serkêşa civakê.  Civaka xwezayî, teza destpêkê ya hebûna mirov e. Di heman demê de hebûna pêhesîna wêjeyê ye jî.  Çawa mirovahî, cara

yekem bi civaka xwezayî re weke hebûnekî civakî karî derbikeve holê, wêje jî bi heman awayî derketiye holê. Beriya derketina wêjeyê jiyana mirovan, weke jiyana tebayan bû. Ev pêvajoya veqetîna nifşê mirovan, ji prîmatan despêdike û heya derketina çînayetiyê berdewam dike. Ji vê pêvajoyê re, mirovahiya demê Paleolotîk û Neolotîk tê gotin.

Dayîkê, ew dengê despêkê ji xwe re texlît kirîn û pêşxistî hêdî hêdî awên dayê, helbestên dahasî afirandin. Bi van helbestên dahasî şêweyê vegotina xwe dan guhartin û bû şêweyê vegotina mirovan. Dayîkan bi van helbestên dahasî zarokên xwe fêrî peyvînê kirin. Bi vê boneyê cara yekem hestên wêjeyî û wêjeyê xwe li gel dayîkê, da diyarkirin.

Vî şêweyê vegotina mirovan, bi devokî heya demek dirêj berdewam kir.

Bi pêşketina berheme re hizirîna mirovan jî pêşket û di encama pêşketina hizirînê re nivîsîn derket holê.

# 2 Amadeyî Wêje

## DAXUYANÎ

Wêje, raman, bûyer, hest û xiyalan bi gotin yan bi nivîskî, ji bo xwendevan yan jî guhdaran, bihest, xuruş, zewq û bedewiya bilind dike re wêje tê gotin.

Wêje hûnerekî yê têgihandinê ye.

Ji berhemên bi vê armancê hatine derxistin re berhemên wêjeyî tê gotin.

Ji hûnerê, dîroka wêjeyê pêştêxe û lêkolîn dike re dîroka wêjeyê tê gotin.

Dîroka wêjeyê li gor armancên nivîsandina xwe guhertinan çêdike.

Di dîroka wêjeyê de tenê berhem nayên lêkolîn kirin, her wiha nivîskar mercên demê, rewşa aborî û civakî bi awayek giştî dinivîse. Hinek dîrokên wêjeyê jî pêşketina cûrên wêjeyê di dîrokê de diyar dikin, hinek dîrokên wêjeyê yên ku pirsgirêk û astengiyên wêjeyê digrin dest jî hene.

## LÊKOLÎN

1.Wêjeyê çawa despêkir û bi çi awayî pêşketiye?
2.Di dîroka wêjeyê de çi tê lêkolîn kirin?

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

Berhemên wêjeyî li ser sê kêrhatinên sereke tê sazûmankirin:

Li ser rêzdayînê

Li ser tevayîbûnê

Li ser xweşikbûnê

Ger wêjevanek van her sê kêrhatinan berçav bigre; dikare berhemek wêjeyî ya xweşik derbêxe holê.

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Li gor we sûdên wêjeyê çine?
2.Gelo ger wêje nebe ziman dê rêkûpêk bê bikaranîn?

## SÛDÊN WÊJEYÊ



Di gerdûnê de “rêkûpêkiyek” ya bi çav tê dîtin heye. Dijber jî di nava vê rêkupêkiyê de, bi hev re di nava hevsengiyê de ne. Ev hevsengî di mirovan de hestên xweşik dertêxe holê û dihêle ku mirov ji jiyanê zewqê bistîne. Xweşik dîtin û zewq standina ji gula ku di nav stiriyan de hatî afirandin, encamê rêkûpêkiya di vê gerdûnê de ye. Ev jî têgehek ya wêjeyê ye.

Ji bo wêjeyê, çand pêwîst e: çawa ku di navbera kar û karkirina lebetên mirovan de cûdahî heye, ji bûna her lebetek bi karibe kar bike, pêwîstî bi oksijen, tîmar û xwînê tê dîtin û ev jî di bingehê rayan de ji hev du tên rêkirin. Wêje jî di nava civakê de rolek bi vî awayî dilehîze. Ji bo ku her lebetek bikaribe karê xwe bike, tişta ku pêwîstiya wan pê heyî pêwiste ji lebetên din bigre.  Wêje jî tevahiyek bi vî awayî çêdike. Pêwîst e mirov jî, ji tevahiyek zûha derbikeve. Pêwîstiya mirovan bi zivirandina hebûnek wêjeyî heye. Ji ber vê çendê sûdê wêjeyê sûdek sereke ye.

Tevayî tevilheviyên di jiyana kes û civakê de çêdibin, çavkaniyên xwe  ji bêzarî, bêgêwilî û bê wêjeyiyê digrin.  Civakên ku di nav wan de rêkûpêkî nebin, ji her yekê dengek cûda derdikeve. Her tişt li hev dikeve. Yekbûn û yekîtî xiradibe. Ji ber ku dem bi rêkûpêk nehatiye bikaranîn, vale tê mezaxtin, pêşkeftin radiweste, kar li hev dikevin. Bê aramî digihe xala rawestînê, mirovên bê aram zêde dibin.

Di jiyana me de, cih û girîngiyek mezin ya axaftin û nivîsîna bi rêkûpêk yanî wêjeyî heye.

## 2 Amadeyî Wêje

### LÊKOLÎN

1.Sûdên wêjeyê ji bo civakan çine?
2.Wêje di encama kîjan hevsengiyan de derketiye holê?

### ZANISTÊN WÊJEYÎ

Ji bo baş têgihandina ziraviyên wêjeyê, cihê bibandor yên wêjeyê li ser civakê, divê wêjeya kesayetên pêşeng lêkolîn bikîn? Ger em li dîroka wêjeya xwe binêrîn, emê bi dehan kesayetên navdar ku wêjeya wan di asta herî jorîn de xweşik û rêkûpêk bibînîn.

## PEYWENDIYÊN DI NAVBERA DIROKA WÊJEYÊ Û DIROKA GIŞTÎ DE



Ji beşê zanista bi belgeyan pêşketina civakbûyîna mirovahiyê, çand û aboriya wê rave dike re dîrok tê gotin.

Hemû tiştên ku mirovan têkîldar dike, di nava dîrokê de ne. Dîroka wêjeyê beşek ji dîroka giştî ye. Bi pênaseyek hêj xweştir, beşek ji dîroka mirovahiyê ye. Pêşketina hizir, raman û hestên civakê yên bi sedsalan jiyayî nîşan dide. Hemû berhemên hizirînê lêkolîn dike.

Ji ber ku zindîbûn û germahiya jiyana civakê bi şêweyê herî nêzîkî wê dide jiyan kirin, dibe çiqek dîrokê.

Di navbera mijara dîroka giştî û mijara dîroka wêjeyî de, hinek cudahiyên girîng hene. Ev di navbera şêweyê dîroka

giştî û dîroka wêjeyî de cudahiyan dertêxe holê. Destpêkê nivîskarê dîrokê, mijara ku pê xerîk dibe demê boriye. Demboriyek wisa ye ku berhemên wê nemaye, tenê hinek şop û belgên wê mane.

Mijarên berhemên wêjeyî yê ku bingehê lêkolîna dîroka wêjeyên e, mirov e.

Dîroka wêjeyê û dîrokzan li ser derbazbûyiyê dixebite; her çiqas heman rêbazên bikatînin jî, lê di pêkanînê de ji hev cuda dibin. Derbazbûyiya dîrokzan li ser dixebite, êdî demê wê temam bûye û bûye malê dîrokê. Derbazbûyiya mijara wêjeyê jî bi berhemên hûnerî hebûna xwe didomîne.

Dîrokzan, li ser kesî bi qasê têkîliya wan bi bûyeran re radiweste; dîroka wêjeyê jî, li ser kesên diyar yên ku berhemên wêjeyî çêdikin, radiweste. Dîroka wêjeyê taybetmendiyên hûnermend û zimanê demê yê lêkolîn kirî, zewqên danûstandinên wêjeyî, lêkolîn dike. Bi vî awayî taybetmendiyên hûnermend û xalên wî ji hemdemê wî cuda dike, dide diyar kirin. Xebatên li ser berhemên wêjeyî, pêktîne. Dîrokzan neçar e,dîtinên kesan yên di berhemên lêkolîn kirî de bide aliyekê, lê dîroka wêjeyê; nêrîna kesan dinixîne û dixwaze bi riya berhemên kesan nivîskar nas bike. Têgeha dîrokzan û dîroka wêjeyê, li hemberî çavkaniyên tên lêkolîn kirin, cuda ye. Çavkanî dibe ku ji bo dîrokzanî bi alî hatibe nivîsandin û xapînok be; lê berhemên wêjeyî xwe weke xwe rast datînin holê. Dîrok derbazbûyiya jiyana civakê lêkolîn dike. Derdor, çand, aborî, berhemên xweşik û her tiştên mirovan têkîldar, dikeve qada karanîna wê. Mijarên dîroka wêjeyê jî,

berhemên wêjeyî, hûnermendê ew behrem afirandî û demê berhem têde derketî holê ye. Dîroka wêjeyê, hûnermendan, berhemên wan û demê berhem derxistî holê lêkolîn dike û bi vî awayî têgeha hûnerî ya demekê diyar dertêxe holê. Berhemên wê demê hatî hawêj kirin û berhemên ku ji wê herikînê bandor bûyî, diyar dike.

**LÊKOLÎN**

1- Li gorî nivîsîna we xwendî di navbera dîroka giştî û dîroka wêjeyê de çi cudahî hene?

2- Dîroka giştî û dîroka wêjeyê demê borî çawa digre dest?

**ZANISTÊN WÊJEYÎ**

Wêje, tiştekî ya pê lehîstin û xweş dem derbazkirinê ye. Xweş dem derbazkirin, armancek sereke ya perwerdê ye. Bê gûman pêwîst e li gel radyo, kovarên wêneyan û sinemayê, cih ji xwendinê re jî bê dayîn.

Wêje zindîbûnê dide mergî. Hêza jiyankirinê zêde dike. Wêje carnan me ji jiyanekî bi êş û xembar dûrdixe. Bi sûdê ji xwendina nivîsînek pexşan yan jî hûnandî ya xweşik tê girtin, mirov dikare xwe ji nexweşiyên rojane biparêze û piştre jî li hember wan nexweşiyên rojane, bihêz û bizanist raweste. Heya ji zarokan re ji bo jiyanê hinek deskeftî neyên dayîn, hêza wêjeyê ya ku mergê wî zindî digre, tênagihe.

## WÊJE XEMLA JIYANA CIVAKÊ YE



Wêjeya ji pêdiviya rastiya dîrokî û civakî derdikeve, wêjeya herî binirx û pîroz e. Her wêje dibe awêneya civak û kesên ku ji bo wan û li ser wan çêdibe. Wêjeya ku rastiya civakê nade diyarkirin, daxwaz û xwestekên gel nade der, pirsgirêk û nakokîyên di hundirê civakê de dikelin, diyar neke û çarenûsa wê jî nedane, wê demê ti nirx û wateya wê wêjeyê nîne. Wêjeya rast ew e ku bi rastiya zemînê jê derketî re bibe yek. Hest û ramanên endamên wê civakê pê hîs dikin, ji ber gelek sedeman, nikarin bînin ziman, wê demê wêje bi hemû rê û rêbazên xwe yên rengereng, wan tiştan dibêje û eşkere dike û çareseriya wê jî datînê holê. Yanî dibe zimanê dil û mejiyê wî gelî. Jixwe hinek berhemên wêjeyî hene ku ji bo hemû mirovên di hinek pirsgirêkan de hevbeş in, hembêz dike, bêyî ku li nîjad, ol, welat û zimanê wan mêze bike, ev dikeve beşa wêjeya gerdûnî, di vê xalê de M. Gorkî dibêje; “Wêje çavê gerdûnê ye, yê ku her tiştî dibîne û diçe heta kûrahiya derûniya mirovan.” Lê divê bihêceta gerdûnîbûyînê, ji rastiya civaka xwe jî dûr nekeve, ji ber ku pêwîst e wêjevan, bi wêjeya

xwe bibe qazidê çand, huner, ziman, ehlaq, rewş, daxwaz û lêgerên gelê xwe ji bona tevahî cîhanê.

Her tim wêje bi hemû awa û şêwazên xwe yên cûr be cûr, ji bo amadekirina zemînê şoreşa hişmendî û civakî çêdike. Şoreşa ku wekî veciniqîneké bê amedakarî û pêşesazî rabe, hêzên giyanî jêre piştevaniyê nekin, wê demê ew şoreşa li ser bingehek sist û lewaz tê avakirin, ti carî nikare xwe têxe nava hundirê mejî û giyana civak û kesan. Ev jî tê wateya ku şoreşeke bê wêje û hûner, bê giyan û mirî ye.

Di vê xalê de Çernîşevskî wiha dinirxîne: "Gelek bêwêje, kor û nezan e. Gelek bi qasê hebûna wêjeya xwe, zana û rewşenbîr." Lewra pêwîst e şoreş û raperînên ku pêşvebirina civakan ji xwe re armanc dikin, nirx û giraniyekê bidine wêjeyê, bi taybet jî wêjeya rastiya civakî ku xizmeta pêşvebirina civakê dike. Kesê dixwaze mejî, hest, pîvan û ramanan di hundirê gel de biçîne û geş bike, divê serî li hêza wêjeyê bide. Hêzên împeryalîst enerjiya mezin ya wêjeyê dîtin, lewra xwestin ku wêjeyê ji naveroka wê derbixînin, ji rastiya wê dûr bikin, di bin navê "Huner ji bo hunerê ye" de, ev kiryarên bênirx pêş xistin. Ev mejiyê hêzên desthilatdar e, naxwazin wêje rola hişyarkirina civakê bilîze. Di vê xalê de Dostoyevskî dibêje: "Yek ji erka wêjeyê şîretkirina mirovahiyê ye." Yanî wêjeya ku ji kûrahiya dil û hundirê gel dernekeve, ti nirx û wateya wê nîn e.

Wêje ji bo xemilandin û xweşikirina jiyanê jî roleke herî bedew û diyar dilehîze. Di şoreşa mejî de, wêje roleke herî

mezin û bibandor dilehîzê, di vê xalê de, A. Ocalan di pirtûka “Çawa Bijîn” de dibêje; “Huner û wêje amrazên ku bêyî wan civak nabe, ji ber ku rawestîna civakî li hember sirûştê, mirov nikare bi riya zanistê û siyasetê tenê rave bike. Ne têrkirina giyanê li ba mirovan bi riyên heyberî, dihêle mirov li şêweyên têrkirina jiyana giyanî bigere, wêje dihêle ku mirov li hember zoriyên jiyanê hênasê bistîne.” Wêjeya ku şoreşê di mejî û giyanê civakê de di afirîne, jêre dibêjin, wêjeya şoreşê ye. Çawa ku şoreş ji bûna hilweşandina zagona kevin û avakirina zagonên nû ye. Her wiha wêjeya şoreşê jî, ji bûna hilweşandina mejî û ramanên kevin û avakirina raman; giyana nû û pêşverû ye.

**LÊKOLÎN**

1.Çi cudahî di navbera wêjeya xwe dipesêre rastiya civakê û ya deshilatdaran de heye?

2.Li gorî we wêje, çawa civakê dixemilîne?


**ZANISTÊN WÊJEYÎ**

Wêje, ji bo naskirina jiyanê dibe alîkar. Ji bo zarok jiyan û riya jiyankirinê fêr bibe, pêwîstiya wî bi berhemên wêjeyî heye. Ji bo rewşên di derbarê kesan de jî tişta berhemên wêjeyê bi me didin qezençkirin, amêrên weke televizyon, radyo û hwd. nikarin bi me bidin qezençkirin.

Hinek rewşên jiyanê hene ku ji wan çêtir tiştek nîne; lê hinek jî bes mirov dikare bi xwendina berhemên

## WÊJE Û CIVAK





Endamê weke bawerî, tore, ol û hwd.  di nava civakê de rê li ber çêbûna çandên cuda vedikin. Her gelek çandek ya wî ya xweser û çêbûnek ya wî ya civakî heye. Ji ber wê çendê, gelên girêdayî çandên cuda, nêrîna wan ya li ser mijarên cuda ne mîna hev in. Bi rastî di roja me de, amêrên têgihandinê, têkîliyên di navbera çandan de asayî kirine. Lê belê pirbûna vê têkîliyê jî nêzîk hev kirin û yekîtiya çandê ya di navbera civakan de çênake. Ji ber ku her gelek, hinek taybetmendiyên wî yên  ji çêbûna wî ya civakî derdikevin, hene.

Weke gelek endamên din, wêje jî endamek çandî ya çêbûna civakê ye. Wêje hem ji civakê bandor dibe hem jî civakê bandor dike. Ji pêşketina çêbûna civakî re dibe alîkar. Nirxên civakî û çandî ji nifşên bên re bi riya wêjeyê radigihîne. Bi vî rengî di çênebûna valehiyê çandî de û di zîndîgirtina zansita civakî de rola wêjeyê mezin e.

# 2 Amadeyî Wêje

Nêzîkatiya wêjeyê ya bi çanda herêmî re, di wêjeyê de çêbûna çanda netewî, bi awayek neyekser mirov dikare weke pêpilka despêkê ya çêbûna civakê bibîne.

Wêjeya ku bi çavkaniyên xwe neyê xwedîkirin, li hember wêjeyek din lewaz e û ji derfetan bêpar dimîne.

Lê belê weke çalakiyên civakî, aborî û çandî yên cûr be cûr, wêjeya armancek ya wê heyî jî nikare xwe di nava tûxubekê de bihizire. Wêjeya ku bi nirxê hizir û estetîkê hatî hûrkolînkirin, bi awayekî gerdûnî bilind bûyî, di nava civakê din de amêrek ya nûnertiya gelê xwe dikeye.

Wêje, bi hev re bangî hest û hiziran dike. Bi vê têgehê derfetê tekûzbûna mirov amade dike.

Wêje; hunerek ya nêzîkatiyên civak bûnê ye û ji hemû cûrên ramanên di civakê de cihgirtîn, hizir û bizavan re vekiriye. Ol, tore, zagon, hûner û her weke din. Di navbera saziyên gel û yên ku wêjeyê lêkolîn dikin de, girêdanek xurt heye. Pênaseyekî ya romanê jî weke neynika li civakê hatî girtine.

Li gor vê pênaseyê wêje jiyanê ravedike. Dîroka wêjeyî jî di heman demê de pêşketina wê ya di dîrokê de lêkolîn dike û dertêxe holê. Di wateyekê de zanista civakî yanî, jiyana mirovan lêkolîn dike. Bi vî awayî dîroka wêjeyî hemû amêrên jiyana civakî di hindirê xwe de digire; di aliyê din de jî berdayîna civakê û ramanê wan tîmar dike û dîroka bizava gel e. Dixwaze civakê bi zanistî rave bike. Ev dox diyar dike ku wêje, dîrok û zanist her tim bi hev re meşiyane.

## LÊKOLÎN

1- Girêdanek çawa di navbera wêje û civakê de heye?
2-Wêje hunerek çawa ye?
3- Nivîskar di guhertina civakê de cihê wêjeyê çawa diyar dike?

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

Wêje, çavkaniya ya rêberiyê ye. Ji bo kesên bixwazin xwe nas bikin, reftarên xwe biguharin, ji derfetan sûd wer bigrin, wêje weke rêberek ya çavkaniyê dikare ji wan re xizmetê bikin.

Wêje girîngiyê dide afrêneriya bandorker. Zarok di xwendin û qadên hunerên dramtik de çiqas dewlemendiyê bi dest bêxe, ewqas jî dikare di qadên jiyanê yê afrêner de jî serkeftî bibin.

Wêje, tê wateya zimanek xweşik. Ji bo zarok zimanê xwe pêşbixin, pêwîstiya wan bi berhemên wêjeyî heye. Wêje, zimanek xweş e û di nava me de zarokê bi zimanê dayîkê bixwazin xweş bi axivin hene? Çawa li gel me, li gel tevayî Cîhanê, berhemê wêjeya devokî ya gelêrî, despêka wêjeya zarokan tê pejirandin.

## 2 Amadeyî Wêje

### XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Zanista gel "folklor, çand, tore, bawerî, mûzîk, lehîstok, efsane, çîrok û wd" çanda gelan lêkolîn dikin.
2. Ew berhemên şanoyî, raman û çîrokên yê hûn bixwînin li ser hebûna zanista gelî baldarbin

### JI WÊJEYA GELÎ SÛD GIRTIN

Hêj ji kevin ve, endamên desteya rewşenbîr, ji çanda gelî sûd girtine. Di gelek helbestên kevin de, pendên pêşiyan hatine bikaranîn. Hozanvanên kilasîk yên Kurd, "Ehmed’ê Xanî, Nalî, Feqiyê Teyran" gelek helbestên bi awayê gelî nivîsîne. Gelek bermayên wêjeya gelî tevlî berhemên wan bûne. Dema ku mirov bikare bi awayek zanistî nêzîk gel û çanda gelî bibe, vegerîne hûner û wêjeyê, wê gencîneyek (xezîneyek) bê dawî pêkbîne. Rewşenbîrên civakekê ji çanda gelê xwe sûd digrin û berheman li gor pêwîstî û vîna xwe dertêxin holê.



Nivîskarek mafê wî yê guhartin û veguhartina amêrên ji çanda gel girtî heye. Yanî pêwîst e çanda rewşenbîran û çanda gel bi hev re bibin yek. Ev mijar pêwîst e netenê bi rêbazên wêjeyî û folklorî bên lêkolînkirin.

"Wêjeya civakê, neynika civakê ye." Ger em bixwazin, wêjeya demên borî têbigihîn û dîroka wê binivîsin; pêwîst e jiyana civakî ya di wê demê de, nêrîn û helwestên cûr be cûr çêbûyîn nasbikin. Govendek ya gel dikare bibe mijara berhemê wêjeyî. Zanînên nivîskar li ser bawerî û jiyana civakên cuda cuda hebin û bikaribin ji wan sûd bigrin, ji bo vê yekê bermayên wêjeyî yên di warê zanista civakî û gelî de divê bên lêkolîn kirin. Lêkolîner û nivîskarên roja me jî dikarin di roman, çîrok, şano û helbestekê de, bi demê borî re girêdanê çêbikin.

Ji bo em destanên "Ezdehaq, Dimdim" hêj baştir têbigihîn û nasbikin pêwîstî bi zanist û rewşa civakî ya wê demê heye.

Her çiqas wêjeya demê me kûrtir û dewlemendtir jî be, lê divê neyê ji bîrkirin, ev wêje li ser wêjeya kevnar hatiye avakirin.

# 2 Amadeyî Wêje

## LÊKOLÎN

1-Ji bo em bikaribin berhemek wêjeyî ya demê borî têbigihin, divê em çi bizanibin?

2-Ji wêjeya gelêrî çawa sûd tê girtin?

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

Wêjeya ji pêdiviya rastiya dîrokî û civakî derdikeve, wêjeya herî binirx û pîroz e. Her wêje dibe awêneya civak û kesên ku ji bo wan û li ser wan çêdibe. Wêjeya ku rastiya civakê nade diyarkirin, daxwaz û xwestekên gel dernaêxe, pirsgirêk û nakokiyên di hundirê civakê de dikelin, diyar neke û çarenûsa wê jî nadane, wê demê çi nirx û wateya wê wêjeyê nîn e. Wêjeya rast ew e ku, bi rastiya zemînê jê derketî re bibe yek.

***Bêguman emê wêjeya demê Neolotîkê pêkbînîn.***

RêberApo

***Wêje; ciwanan digihîne, kalan bi zewq dike, di exbalê de xemle, di karesatan de dibe xemrevîn û cihê debarê.***

Cicero (Çiçero)

***Wêje; komarek ya nivîskaran anî holêye.***

Moliere (Moler)

***Ya jiyanê xweşik dike, mirovan girêdayî jiyanê dike, hestên bi gewher dewlemend dike, wêje ye.***

Suut Kemal Yetkin

***Wêje pêşengê jiyanê ye, wê texlît nake, awayê dixwaze dide jiyanê.***

Oscar Wilde (Oskar Vaylt)



## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1. Rewşa wêjeya Kurdî di sedsala XIV'an de çawabû?
2. Çima wêjeya Kurdî di sedsala XIV'an de derfetê pêşketinê dît?

# BEŞA II.

## DI SEDSALA XIV'AN DE REWŞA WÊJEYA KURDÎ




Di sedsala XIII û XIV'an de rewşa Kurdan ya civakî û ramyarî gelek aloz bû. Di despêka van sedeyan de gelê Kurd û Kurdistan dibin nîrê dagiriyê de jiyan didomandin. Ereb li ser bingeha feodalîzmê û bi hêceta olekî nû dest danîbûn li ser Kurdistanê. Kurd rastî zilm, zor, dijwarî, talan, koçkirin û konevaniya bişaftinê tên. Di bin zorê de

beşekî mezin ji Kurdan dest ji olê xwe yê bingehîn "Zerdeştî" berdabûn û bi zora devê şûr bibûn musilman. Di sedsala XIV’an de wêjeya Kurdî derbazî qonaxek nû bû. Weke me di pirûka amadeyî yek de jî dabû diyar kirin, bi hatina Îslamê re hem xwendevanî zêdetir bû hem jî wêje û zimanê Kurdî ketin ber pêla bişaftinê. Çiqas wêjeya Erebî xwe di nava gelê Kurd de bi cih dikir, bandora wê ya li ser wêjeya Kurdî jî zêdetir dibû.

Ji xwe ji derveyî hinek kesên diyar, wêjevanên, bi zimanê Erebî xwendîn, xwe radestî wê çand û wêjeyê kiribûn. Di nava vê aloziyê de jî, di aliyê dîrok û zanistî de hinek gav dihatin avêtin. Van gav avêtinên binirx, berhemên xwe di sedsala XIV’an de bi awayekî diyar danîn holê. Di vê sedsalê de hestên netewî di nava helbest û stranên hozanvanên Kurd de hatin diyar kirin.

Ji wê dîrokê û vir ve herçiqas bandora wêjeya Erebî di nava wêjeya Kurdî de diyarker jî be, lê her ku çû hestên netewî di nava rewşenbîr û gelê Kurd de pêşketin. Bêgûman vê pêşketinê bandorek erênî di aliyê netewî, aborî û civakî de jî çêkir. Gelê Kurdê ku berê wê demê, xwe ji bîrkirî û ji hev hatî belavkirin, piştî vê demê kêm jî be, ber bi kombûnekê ve çû. Bi vê kombûnê re Kurdan çand, tore, ziman û wêjeya xwe pêşve birin. Bingehê gelek saziyên çandî, aborî û civakî avêtin. Ev jî dibe sedem ku gelek zimanzan û wêjevanên navdar derkevin holê.

Di vê sedsalê de navendên çandî yên herî girîng li herêma Botan û Behdînan pêşketin. Di van navendan de bingehê hestên welatparêzî dihatin avêtin.

## 2 Amadeyî Wêje

Van hestên welatparêzî bi Feqê Teyran despêkir û di demê Ehmedê Xanî de giha lûtka herî bilind.

### LÊKOLÎN

1-Di sedsala XIV'an de çi guhartin di wêjeya Kurdî de hatin dîtin?

2-Bingehê hestên welatparêzî despêkê li kîjan herêmên Kurdistanê hatin avêtin?

# XEBATÊN AMADEKARIYÊ


1. Gelo we carnan helbestên Feqê Teyran xwendine ger we xwendi be, çi tiştî têde bala we kişandiye?

2.Çima dibêjin helbestên Feqê Tayran coşê dide peyda kirin?

## Helbesta Fêqê Teyran

***<u>HÊZ</u>***

***Beyta min pir xweş e, guh bidin xwedî kemal***



*Ey av û av, hey av û avan*
*Ma tu bi eşq û muhbetî*
*Mewcê pêlan davê pêlan*
*Bê seknî û bê rehetî*

*Bê rahetî û bê seknetî*
*Yane eşqa ya xwe xewnetî*
*Yan şubheta qelbê minî*
*Ji eşqa kê natebitê*

....
*Da ez bizanim vê sirê*
*Ji hindikî heta pirê*
*Ji me nîyan vê gur gurê*
*Ji kê re dikî vê taetê*

*Ji kê re dikî zikrê bi hal*
*Qet kiş kişê nakî betal*
*Teşbihê min rehet û emal*
*Qet bi şev û rojan xew netê*

*Lo şev û rojan bê xewî*
*Ji mihnetê yek ditewî*
*Şev tariya qet nahewî*
*Ji emrî bilez ketê*

*Daîm diçî dengê te tê*
*Dengê te tê bi roj û şev*
*Pêl radibin ji mewcê kev*
*Seyrane ji rengê qudretê*

*Geh geh spî teşbihe şîr*
*Mislê te qet nabin çû şîr*
*Avê! ha diherî yar tê te bîr*
*Mêla hebîbê bi çûna te tê*

*Lazim te mehbûbek heye*
*Yan mêl û metlûbek heye*
*Yan dost û meqsûdek heye*
*Yan sire û mermûzek heye*
...
*Digerî devê pir dinê*
*Qet nanivî, nasekînî*
*Reh şuphetê qelbê minî*
*Ji muhbeta nezehmetê...*

**Peyv:**

**Muhbet**:Heskirin
**Mewc**: Pêl
**Şubhet**:Mîna
**Taet**:Îbadet
**Zikr**:Ji bo Xudê tiştên bi dev tên kirin
**Teşbih**: Weke
**Mihnet**:Bêzarbûn
**Daîm**:Her dem
**Qudret**:Hêz
**Misl**:Weke
**Mehbûbek**:Heskiriyek
**Metlûbek**: Daxwazek
**Meqsûdek**:Qastek
**Mermûzek**:Tiştek te kirî sembol

## JINAMEYA FEQÎYÊ TEYRAN (1307-1375’ê zayin )



Hozanvanê kul û derdan, evîndar û dildarê navdar Feqiyê Teyran yek ji klasîkên wêjeya Kurdî yê hêja ye, bi navê Feqê Teyran tê nasîn. Bi awayek diyar tê zanîn ne navê wî yê rast e; belkî nasnavê wî ye. Navê wî yê rast Mihemed e. Di helbestên xwe de jî navê xwe weke Mihemed carnan jî weke Feqî bikaraniye. Hinek dibêjin li Hîzanê û hinek jî dibêjin li Miksê hatiye Cîhanê. Lê li gor helbestên wî, em têdigihîn ku Feqê Teyran li Miksê hatiye Cîhanê. Ji bo mîsogerkirina vê jî emê malika helbesta wî li vir binivîsin:

***“Miksî dibê avê we bû***
***Pêxemberan aqil hebû***

***Qet hewcyî pirsan nebûn***
***Baş guh bide vê sohbetê”***

Her çiqas li gor belgeyên di destê me de, em gihane wê baweriyê ku Feqiyê Teyran di navbera salên 1307-1375’ê zayînê de jiyaye. Lê divê neyê ji bîr kirin ku Feqê Teyran hemdemê Melayê Cizîrî ye. Ji ber ku di dîwana Melayê Cizirî de nameyên hûnandî yên di navbera Mela û Feqe de çûyîn û hatîn hene. Ev dide diyar kirin ku yan Mela Cizirî di vê dîrokê de jiyaye yan jî Feqê Teyran di dîroka jiyana Melayê Cizirî de jiyaye.

***Gelek berhemên navdar yê Feqiyê Teyran hene:***

1.Dîwan helbestan
2.Çîroka Zembîlfiroş
3.Çîroka Bersîs
4.Qewlê Hespê reş
5.Çîroka Şêxê Senaniyan
6.Destana Xanê Dimdim

Destana Şêxê Sananiyan Ji "313"Malikên çarikan pêkhatiye. Şêxê Senaniyan girîngtirîn berhemên Feqiyê Teyran yê ku şojeya wê li ser bawerî, welatparêzî û evîna rast e. Feqê Teyran mirovek zêde pak bû. Xwestiye ku cihê ew lê bijî çi bê mafî lê çênebe, ji ber vê yekê tim geryaye ku cihekî herî vehêz û paqij bibîne û lê bijî. Feqê Teyran helbestvanek gelêrî ye. Helbestên xwe ne bi zimanê koç û serayan ne jî bi wêjeya dîwanê, bi ziman û wêjeya gel sazkirine. Dema helbestên wî tên xwendin, gel bi hêsanî têdigihe.

**LÊKOLÎN**

1.Çima di nava civakê de ji Feqê Teyran re Feqê Teyran tê gotin? Lêkolîn bikin.
2.Naveroka destana Şêxê Senaniyan li ser çiye?

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

Ji wekheviya dengên li dawiya rêzikên helbestan re qafiye tê gotin.

Qafiye herî kêm wekheviya dû peyvên deng û nivîsîna wan wekhev lê wateya wan cuda yan jî wekheviya dengên li dawiya rêzikan re qafiye tê gotin.

Qafiye li gor ahengiya deng di navbera xwe de dibe pênc beş.

1.Qafiye Lewaz (Nîv qafiye)
2.Qafiya Tam
3.Qafiya Dewlemend
4.Qafiya hevdeng  (cins)
5.Qafiya Taç.

Feqê Teyran di helbestên xwe de hemû cûrên qafiyeyan bikaranîne.

Dema em temaşeyî malika despêkê ya helbesta jor dikin, dibînin ku qafiya dewlemend bikaraniye.

Mînak 1:
***Ey av û av, hey av û av***
***Ma tu bi eşq û muhbetî***
***Mewcê pêlan davê pêlan***
***Bê seknî û bê rehetî***

Lê dema em temaşeyî malika çarê dikin, dibînin ku bi qafiya tam nivîsandiye.

Mînak 4:
***Ji kê re dikî zikrê bi hal***
***Qet kiş kişê nakî betal***
***Teşbihê min rehet û emal***
***Qet bi şev û rojan xew netê***

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1.Çima di wêjeya Kurdî de hozanvanên jin kêm in?
2. Gelo we helbestên hozanvanên jin xwendine?

## HELBESTA NAZDAR XATÛNA ŞÎRAZÎ

*Yaran yaweran ray heq rastî yan*
*Pakî û dirûstî û rind û xasî yan*

*Her kes wêş nasa Muhemed asa*
*Bêşik ew kes e mewlayîç şinasa*



### DAXUYANÎ

***Wate: EyYaran! Ey hevalan! Riya Xuda rastî ye û pakî, dirûstî, bexşandin û çakî ye. Her kesê ku wekî Hafî Mihemed, xwenasî (xwe binase) bêguman wê Xuda jî binase. Wê pîra helbestkaran balkişandiye li ser gotinekê; pêxemberê Îslamê ku dibêje: "Her kesê xwe binase, Xuda jî dinase."***

## JÎNAMEYA NAZDAR XATÛNA ŞÎRAZÎ



Ev helbestvana jina ku di sedsala XIV’an de jiyaye, li gorî bîrnivîsan di dawiya sedsala VII’an ya koçî de li Şîrazê ji dayîk bûye. Her li wir xwe gihandiye. Ew di felsefeya Yewnaniyan de xwedî hizirek kûr û berzbû. Wê di despêkê de dest bi raz û niyazan kiriye. Bi zana, şêx û pîran re civiyaye û piştî demekê çûye Şîrezûrê û paşî çûye Şêxanê û dev ji cîhanê berdaye. Demekê li gel San Serhak maye. Heta bawernameya xwe ya şêxîtiyê jî wergirtiye. Paşê vegeriyaye herêma xwe, jiyana xwe ya mayî, bi rê nîşandana jinan re bûrandi ye. Ew di sala 1363 yan de çûye ber dilovaniya Yezdan û ew li wir spartine axê.

Di pirtûka Serencamê de tê nivîsîn ku Şêx Nazdar Xatûna Şîrazî yek ji 72 pîr û hevalên San Sehake ku di sedsala çardemîn de jiyaye. Ji vê helbestkara zana gelek helbestên bi zaravayên Goranî bi cih mane.

# 2 Amadeyî Wêje

## LÊKOLÎN

1.Li gorî we di helbesta wêjevana nemir Nazdar Xatûna Şîrazî de kîjan qafiye û pîvan hatine bikaranîn?

2.Wêjevana me xwediyê kîjan baweriyê ye?

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1.Gelo we carnan mewlîdname xwendiye yan jî guhdar kiriye?

2. Berhemên herî zêde yê Melayê Bateyî ku di nava gel de tê bikaranîn kîjane?

### Helbesta Melayê Bateyî



***Ey dil werin dîsan bi coş***
***Carek ji caran mey bi noş***
***Bikin qiseta Zembîl Froş***
***Da seh bikin hîkayetê***

***Zembîl Froş lawkê rewal bû***
***Bi kilfet ehl û eyal bû***
***Hisnekî usif li bal bû***
***Heq rezaqê qismetê***

***Qewîn ew lawê feqîr bû***
***Dayima xwedî debîr bû***
***Di pîşêyê xwe de jîr bû***
***Ew bi dest hebû senetê***

***Şixlê wî selku tebeq bû***
***Qîmeta selkan wereq bû***
***Dayima ew raste heq bû***
***Pê dabirînê kilfetê***

***Ew bi dest Zembîl bi dest***
***Di birê bazarê bi qest***
***Xwarin anî hate bi dest***
***Razî di bû bi qismetê***

***Her demê selkan ku tîne***
***Xatûnek jorda di bîne***
***Bi dil û can dihebîne***
***Dil kete pêla muhbetê***


***Muhbetê keç mubtela kir***
***Sur li carya eşkera kir***
***Lawikî qelbim cuda kir***
***Min ji eşqa xew ne tê***

***Lawik rast bû bi Xudê re***
***Pir ji wê qenca dikê re***
***Go, min ji te navê tû zêre***
***Min xilaskî ji zehmetê***

**Peyv:**

**Bînoş**: Vexwarin
**Qiset** : gotin
**Rewal** : koçber
**Kilfet** : xêzan
**Hûsn** : Xweşik
**Raziq** : Yê xwarina yekê dide tê
**Qismet** : Nesîb
**Qimet** : nirx
**Wereq** : Dirav
**Hebandin** : Hêjêkirin
**Muhbet** : Heskirî
**Hikayet**:Çîrok

## JÎNAMEYA MELAYÊ BATEYÎ



Navê wî yê rastî Ehmed e. Li gundê Batê girêdayî bajarê Colemêrgê li sala 1417 ji dayîkbûye. Tê gotin berhemên wî yên navdar Mewlûd û destana Zembîl Firoş e. Destana Bateyî bi gelek zimanan jî hatiye wergerandin (Rusî, Farisî, Erebî). Mewlûd

destanek jînameya ku jiyana Hz.Mihemed dide têgihandine. Di baweriya bawermendên Kurd de weke destanek pîroz tê pejirandin. Melayê Bateyî di sala 1491'ê de, li gundê Bateyê çûye berdilovaniya Yezdan. Mixabin nayê zanîn ka gora Bateyî li kîjan bajarê Kurdistanê ye. Destana Zembîlfiroş, destanek dîrokî ye (folklor) ku evîna

***"Ji çireya paşî û pêde***
***Melayê Bateyî kanî***
***Sefer kêşa bi Miksê de***
***Li ser wextê zivistanê"***

jinek begzade li hember zelamek feqîr ku gihiştina wan ne pecan e pêkhatiye. Melayê Bateyî li cihê lê jiyan kirî bi vî awayî nivîsandiye:

Dema em malik ali jor temaşe dikin, têdigihin ku Melayê Bateyî li bajarokê Miksê di Medreseya Mîr Hesenê Welî de li gel Mîrê Miksê xwendiye. Melayê Bateyî mirovek zana, jîr û helbestvanek hêja bû. Berhemên wî ev in:

1.Mewlûd (Jînameya Hz. Muhemmed)
2.Dîwanek ya helbestên wî
3.Destana Zembîlfiroş

## LÊKOLÎN

1.Melayê Bateyî kengî û li kûderê ji dayîk bûye?
2.Melayê Bateyî li kûderê xwendiye?
3.Melayê Bateyî kengî mewlûd nivîsandiye? Lêkolîn bikin.

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

### 1-Qafiya lewaz (Nîv qafiye)

Ji wekheviya dengekî dengdar li dawiya rêzikên helbestan tê dubare kirin re re qafiya lewaz tê gotin.

Ev wekhevî herî kêm divê di dû rêzikan de hebin.

Dema em temaşeyî malika li jêr dikin; dibînin ku li pêşiya redîfê qafiya lewaz “a, a, a” hatiye bikaranîn. Ev cûre qafiye kêm jî be, di helbestên Kurdî de tê dîtin.

**Mînak:**

Muhbetê keç mubtel**a** kir → redîf
→ Q. Lewaz
Sur li carya eşker**a** kir → redîf
→ Q. Lewaz
Lawikî qelbim cud**a** kir → redîf
→ Q. Lewaz
Min ji eşqa xew ne tê

## Helbesta Yay Hebibiyeya Şarezorî

Aziz binyama, Aziz binyama
Aziz şertîman çenî binyama

Ha peyrow, şertî ce girdin cama
Sikey başlixman be binyam wama

Be derya westen, be derya west en
Bargey binyamiman be derya west en

Yurt gilême kol ce keştî rest en
Ha binyamîna ce koy xem mest en

Aramîman niya aramîman niya
Aziz bê binyam aramîman niya

Pey adî şadî behşetî biya
Taze û naxûniman mekeve çiya


Ha çe keştî da, ha çe keştî da
Yurt remzîbarî ha çe keştî da

Serafa çenî, xelk û reştî da
Elemdar û çerx çew zeştî da

DAXUYANÎ

Wate: Ey rêberê minê eziz, her di roja berê de, me bi binyamîn re peyman girêday e. Ew di her qalib û cildekî de, pir rêz û rêçên me ye û em tenê serî dispêrin wî. Bargeha Binyamîn li deryayê ye û niha di qalibê hiriyê û bi tûrikekê di nava keştiyê de dijî. Ew li çiyayê ne rihetî û nexweşiyê serxweş û mest e. Ey rêberê minê ezîz? Bê Binyamîn me aramî tine ye û ew ji me re şahî û buheşt e. Em nikarin ji wî dûr bimînin. Vaye Remzbar jî di keştiyê de ye û di keştiyê de zêr û gewheran diguhare. Ew al hilgirê vê demê ye.

## JÎNAMEYA YAY HEBIBEYA ŞAREZORÎ



Li gor hinekan, ev helbestkar di sedsala XIV'an de jiyaye û navê wê Hebîbiye ye. Hebîbe keça Şêx Sedredînê Şarezorî ye. Li gor bîrnivîsên Qerendî, ev helbestvan di sala 1282'an de li gundê Yawa ji dayîk bûye. Di despêkê de Yay Hebîbiyayê li cem bavê xwe xwendiye û piştre jî çûye dibistanê. Bi xwendina rêzimana Erebî û wêjeya Erebî û Farîsî ve xerîk bûye. Piştî wê bi birayê xwe

re çûye Helwanê û li wir dû salan feqetiya Îslamê kiriye û lêkolînên li ser Quranê xwendiye.

Dema ku ew vegeriya malê, dîtin ku bavê wê çûye berdilovaniya Xudê. Ji ber vê êşê ji wir diçe. Heskirina Xudê ew ber bi evînekê ve dikişand. Lewra wê û birayê xwe riya Şêxanê girtin û li wir dibe kevoka bask şkestî ya San Sehak û rêz û rêçkên rêbaza Yarî hîn dibe. Temenê xwe yê mayî, bi wane dayîn û rê nîşandayîna gel ve derbas dike. Pevjîn nebûye.

Di sala 1348'an de, di temenê 66'saliya xwe de diçe berdilovaniya Yezdan û li goristana Şêxanê vedişêrin.

Ji Yay Hebibeyê gelek berhem û helbestên şirîn û xweş li cih mane. Tevayî berhemên wê di pirtûka Serencam de hatine weşandin.

**ZANISTÊN WÊJEYÎ**

Baweriya Yarî, baweriyek herî kevin ya herêma Kermanşahê ye. Bi Kurdî weke Yarsanizm, Farisî; Yarasanizm, Ereb jî wan weke Elh û Heq dizanin. Lê tê gûman kirin ku koka vê baweriyê ji koka Ezdiyê be. Lewra di gelek aliyan de wek hev in.

Li gor hinek çavkaniya ev bawerî di sedsala VIII'an de ji aliyê Behlûlê Mahî ve weke ol yan jî weke mezhebekê sazkirin û ev bawerî bi helbest û muzîkê tê ragihandin. Di zivistanê de sê rojan, rojiyê digrin. Weke Alewiyan cemê digrin û li ser agir re rêve diçin. Dûayên wan bi Kurdî ne.

## HELBESTA XATÛN DAYRAKA REZBAR

Bi we quwey dil, Bi we quwey dil
Ezîz emr tû bi we quwey dil

Her çi fermawayt qebul en qebûl
We yadim meyo wişiyanim meşxûl
Medey şahidî ez we bêmuşkûl
Ne lewh yaqût atêş kamil

Heftewan ce mûr şahbaz adil
Pey şert mêrdan tû kerd we hasil
Perê destgirî yaran fazil
Duhem meylit kerd azîz we mobet

Hem ew heft nûr en çêgat kerd mud det
Ce pirdîwerda niyanit suhbet
Awerdîwe di pey destgirî şert
Heftewan destgirî neda ro şohbet

Hefta û dû sef yar serdan neyargiyan
Cew kar zînan mêrdan dîwan
Girdîn xulaman bêwen bêwenan
Rû malan ew şert sikeyî heftwan

# 2 Amadeyî Wêje

Her ce new duma ta aman weyga
Zat heft mezher nigînen çêga
Her ce new duma ta axir zeman
Destgirî heftewan bi gîrdîş daman

Her ke ney duma bikero xeter
Bilawno îqrar şert pir dîwer
Bişano hengam muxtey zîyadîter
Beşiş mewran ce hewz kewzer

## DAXUYANÎ

**Wate**: Ey heskiriyê min! fermana te bûye hêza dil. Tû çi dibêjî tê pejirandin û tê pesn kirin. Dema ku ez roja berî û hesabê dihizirim, yekser dilêmin dibişkive û ez guman dikim ku te div ê rojê de hew tewan afirandiye. Te soz jê stand ku li Cîhanê gel bi başî birêve bibî û rê nîşanî wan bidî. Te li Cîhanê jî ew dane xuyakirin. Ey heskiriyê min! te baş kir ku hew tewan (heft stêrk yan jî heft biran) li qalibê mirov de afirand û te li Şaxanê dîwana bas û rawêj damezrand. Ku va bû dive heftê û dû pîr giyana xwe di riya wan de feda bikin û gel serê xwe bispêre wan; ji ber ku Hewtewan wekî nigina kelkevan in û divê her kesek serê xwe ji wan re bitewîne. Li gorî peymanên wan tev bigere û piyê xwe ji lihêfa xwe dirêjtir neke; da ku ji ava kewserê bêbeş û bêpar nemîne.

## JÎNAMEYA XATÛN DAYRAKA REZBAR



Navê vê helbestvana hêja Dayrak Xanim e û keça Hisên Begê Celd e ku li gorî pirtûka Serencamê, ew di serê çarika dawî ya sedsala XIII'an de, li bajarê Helwanê ji dayîk dibe. Di zarokatiya wê de, bavê wê ji bo perwerdekirina keça xwe mamosteyek taybet digre û Dayrak Xanimê perwerde dike. Piştî ku hînbûna seretayî li gel mamostayê xwe yê taybet dît, diçe dibistanê û fêrî xwendina Quranê dibe; li gel wê jî fêrî xweş nivîsînê dibe. Ew di temenê nozdeh saliya xwe de, li gel Şêx Îsa Berzencî pevjîn dibe.

Xatûn Dayrak, helbestvanek Xuda tirs, zana bû û di sedsala VIII'ê koçî de jiyaye û li gundê Şêxan koça dawî kiriye û gelek berhem li pey xwe hêlane. Di berhemên xwe de piranî li ser evîniya rast vehûnandiye, ji ber ku baweriya wê bi jiyana paş mirinê hebû; serfiraziya mirov di mirinê de dîtiye. Ew li ser vê baweriyê bû ku divê mirov di riya evînê de têbikoşe û hemû tiştî bispêre evînê. Piranî helbestên wê li rê û rêçkên rêbaza Yarî bûn. Ew di lêdana tembûrê de şareza bû û wê piranî helbestên xwe li ber awaza tembûrê lêdaye û xwendiye.

DAXUYANÎ

## 2- Qafiya Tam

Ji wekheviya du dengên li dawiya rêzikên helbestan tên dubare kirin re qafiya tam tê gotin.

Ev wekhevî herî kêm divê di dû rêzikan de hebin.

Dema em temaşeyî malika li jêr dikin; dibînin ku li dawiya her sê rêzikên despêkê dû deng wekhev hatine bikaranîn û ji ber wê çendê qafiyeya tam e.

***Mînak***:

Her çi fermawayt qebul en qeb**ûl** → Q. Tam

We yadim meyo wişiyanim meşx**ûl** → Q. Tam

Medey şahidî ez we bêmuşk**ûl** → Q.Tam

Ne lewh yaqût atêş kamil

**LÊKOLÎN**

1.Hûn jî malikekê peyda bikin, bila qafiya wê tam be?

2.Xatûn Dayrak kengê ji dayîk bûye?

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1.Xwendina helbestên Melayê Cizîrî li xweşa we diçe?
2.Çima Melayê Cizîrî weke hozanvanê Tasawufî tê naskirin?

### Helbesta Melayê Cizîrî

## DIL JI MIN BIR



***Şox û şengê zuhre rengê***
***Dil ji min bir dil ji min***
***Awirên heybet perengê***
***Dil ji min bir dil ji min***

***Wê şepalê misk û xalê***
***Dêm dûrê gerden şepalê***
***Cebheta biska semalê***
***Dil ji min bir dil ji min***

***Zilf û xalan nûn û dalan***
***Wan ji min dil bir bitalan***
***Goşeyê qewsê hilalan***
***Dil ji min bir dil ji min***





***Dêm nedirê bû enbîrê***
***Xemrî û gîs û herîrê***
***Sînekir armanca tîrê***
***Dil ji min bir dil ji min***

***Sor şîrînê, nezanînî***
***Kuştim û nake yeqînî***
***Wê bi çengala evînî***
***Dil ji min bir dil ji min***

***Fitr û taban dan xuraban***
***Eblaq û cûtê şebaban***
***Da me ber penc û kulaban***
***Dil ji min bir dil ji min***

***Xweş xeramê ez xulamê***
***Nazikê şîrîn kelamê***
***Tûtiya eywan meqamê***
***Dil ji min bir dil ji min.***

**Peyv:**

**Sîne**: sing
**Zûhr**: Kulîlk
**Semal**:Bayê Sibê
**Zilf**: bisk
**Dal**: Navê tîpekê
**Nûn**: Navê tîpekê
**Nedîr**: Nediyar
**Enbîr**: bêhna xweş
**Yeqîn** : bawerî
**Fitr**:Xêra seriyan
**Taban**:Xêr
**Xurab**:Qijak
**Eblaq**: Gihayî
**Şebaba**:Ciwan

## JÎNAMEYA MELAYÊ CIZIRÎ



Melayê Cizîrî helbestvanek hêja û xwedî hizirînek kûr ya wêjeyê bû, helbestên wî weke tasawûfî tên naskirin. Helbestên wî di mizgeft û hicrên feqîyan de dihat xwendin û ji berkirin. Navê wî di gelek pirtûkên li ser Kurdan hatin nivîsîn de, derbaz dibe. Navê wî yê rast Şêx Ehmedê Kurê Şêx Muhemedê ji herêma Botan, ji navçeya Cizîrê, li sala 14O7’ê ji dayîk bûye. Di derbarê demê jiyana Melayê Cizîrî de gelek nêrînên cuda hene lê em bawer dikin ku ya herî nêzîkî rastiyê ev e. Ji ber ku Melê di helbesta xwe de wiha gotiye:

> “Sefsef me dî hindî û zeng
> Cengizî hat tîmûrê leng
> Xef wan reşandin dil xedeng
> Teşbîhê tîrên xan şeref”

Dema em vê malikê temaşe dikin ku em têdighin ku demê Melayê Cizîrî dikeve nêzîkî demê Tîmûrê Leng yê ku di salên 1336-1405’an de jiyayî.

Ji eşîra Botî’yaye. Li tevayê Kurdistanê geryaye. Gelek zanist girtine. Zimanê Erebî, Tirkî û Farisî baş fêrbûye. Melayê Cizîrî li sala1481’ê li Cizîra Botan çûye berdilovaniya Yezdan.

Melayê Cizîrî di "Medresa Sor" ya li Cizîra Botan de feqetî û mamostahî kiriye û her wiha gora wî jî di heman medresê de ye. Melayê Cizîrî eşqa wî ya rast mecazî ku naverokên wêjeya tesawufê bi zimanê Kurdî gotiye. Helbestên wî bi awayekî xurt bi hevdu ve hûnandine. Hestên rast li ser daxwaz û xwesteka gelê xwe ya ku dixwazin ji bindestiya desthilatên Tirk û Farisan di aliyê siyasî û wêjeyî de rizgar bibe, aniye ziman. Kariye bi serkeftî gotinên Farisî û Erebî û wêjeya Rojhilat di helbestên xwe de divehûne, bi zimanê Kurdî bang li gelê xwe dike û di vê helbesta xwe de dibêje:

> “Ger lulû mensur ji nezmî tû dixwazî
> Wer şîrên Melê bîn, te bi şîrazî çi hacet”

Helbestên Melayê Cizîrî pir xurt in û li cem Kurdan pir bi nirx in .

Melayê Cizîrî dîwanek helbesta ya bi nav û deng nivîsandiye.

**ZANISTÊN WÊJEYÎ**

## 3- Qafiya Dewlemend

Ji wekheviya sê dengan û zêdetir dengên li dawiya rêzikên helbestan tên dubare kirin re qafiya dewlemend tê gotin.

Ev wekhevî herî kêm divê di dû rêzikan de hebin.

Dema em temaşeyî malika li jêr dikin; dibînin ku li dawiya her du rêzikên despêkê redîf heye beriya redîfê qafiya dewlemend tê dîtin.

**Mînak**:

Xweş xeramê ez xul**am** → ê Redîf
→ Qafiya dewlemend

Nazikê şîrîn kel**am** → ê Redîf
→ Qafiya Dewlemend

Tûtiya eywan meqamê
Dil ji min bir dil ji min.

**LÊKOLÎN**

1.Helbestên Melayê Cizîrî li ser çi tên nasandin?

2.Melayê Cizîrî kengî û li kûderê ji dayîk bûye?

3.Dema em dibêjin qafiya dewlemend, em çi têdigihin?

## HELBESTA BEKIR BEGÊ ERZÎ

Bi derkevtim temaşa kem têna rojê dinê dabû
Xiyala dîlberê nakim, medîna min ku peydabû

Medîna kim, ji îhsanê hilên perda derîzanê
Ji burcê hate eywanê, miqabil hat û westabû

Miqabil hat û rawesta, du xadim dest li ser destan
Li pêşî dîlberê westa, hilat roja'l dinê dabû

Hilat roja weku wextê binêrin talii û bextê
Dû dest rûnişt li ser textê sifet hûrî Xudê dabû

Sifet hûrî melek xoybû, elîf bejin perî rûbû
Keşîdenûn û ebrû bû, berê xo wê bi min dabû

Berê xo da bi min carik, hilîna xanimê çarik
Me dît hilbû ji wê narik, çek û zêra şefeq dabû



## JÎNAMEYA BEKIR BEGÊ ERZÎ



Navê vî helbestvanê hêja; Bekir Begê Erzî ye. Li gor belgeyên di destê me de, ew di sala 1637'an de, li gundê Erzê ya girêdayî navçeya Amêdiyê ji dayîk bûye.



Bekir di zarokatiya xwe de bi xwendinê re xerîk bûye. Piştre ji bo xwendinê diçe Hucreyên Feqan. Ji bo dawî anîna xwendina xwe, li gelek cihên Kurdistanê digere. Demekî dirêj li Amêdiyê dimîne. Piştî wê jî demek li Dihokê dijî. Di dawiyê de xwendina xwe li Akrê tekûz kiriye. Piştre dizivirê Zêdê, temenê xwe yê mayî di riya agadarkirin û perwerdeya gel de derbaz dike.

Di sala 1672'ê de yanî gava ku temenî wî 35 salî bû, diçe berdilovaniya Xudê. Ew wesiyet dike ku wî li goristana Erzê veşire.

Bekir Beg, yek ji mezintirîn helbestvanê Kurd tê jimartin. Weke stêrkek geş di esmanên wêjeya Kurdî de diçirise. Bekir Beg , wekî gelek helbestvanên din evîndarê xwezaya xweşika Kurdistanê bûye.

**Peyv:**

**Sifet**: Hevalnav (berjeng)
**Tên**:Têhn, germahî
**Miqabil**: Beramber
**Şefeq**:Ronî
**Nar**:Agir
**Ebrû**:Îro
**Keşîdenûn**:Tişta di cih de

**ZANISTÊN WÊJEYÎ**

## 4- Qafiya Hevdeng

Ji wekheviya du peyvên nivîsîn û dengên wan wekhev û wateya wan cuda dikevin li dawiya rêzikên helbestan re qafiya hevdeng (cins) tê gotin.

Ev wekhevî herî kêm divê di du rêzikan de hebin.

***Mînak***:

Kesên ku di riya azadiyê de navêjin ti **gavan** ⟶ Q. Hevdeng

Bêgûman dê tim û daîm ji serdestan re bibin **gavan** ⟶ Q. Hevdeng

**LÊKOLÎN**

1. Bekir Begê bidin nasîn?

2. Malika li jêr şirove bikin û li lênûsa xwe binivîsin.

"Berê xo da bi min carik, hilîna xanimê çarik
Me dît hilbû ji wê narik, çek û zêra şefeq dabû"

3. Mînakek ya qafiya hevdeng çêkin.


## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1.Çima Ehmedê Xanî weke hozanvanekê Netewî tê naskirin?

2.Felsefa Zimanê Kurdî kê daye despêkirin?

## JÎNAMEYA EHMEDÊ XANÎ

Ehmedê Xanî, helbestvan, nivîskar û fîlozofê herî mezin yê gelê Kurd tê nasîn. Xanî, di wêje û toreya Kurdî de, weke stûneke bingehîn tê pejirandin. Xanî wêjevan, zanyar, rewşenbîr û derhênerê ramana serxwebûn û azadiya gelê xwe tê dîtin.



Ehmedê Xanî (1650-1707).

Ehmedê Xanî, xwe bi xwe dîroka dayîkbûna xwe di malikekê de diyar dike:

> ***"Lewra ku dema ji xeybê fekbû***
> ***Tarîx hezar û şêst û yek bû "***

# 2 Amadeyî Wêje

Weke ji helbestê jî tê zanîn Xanî 1061'ê koçî, beramberî 1651'ê zayînî li Beyazîdê ji dayîk bûye. Navê bavê wî Şêx Îlyas e. Bapîrê wî Eyas û Kalê wî jî Rûstem e. Navê wî yê rast Ehmed e. Nasnavê wî jî Xanî ye.

Xanî li bajarê Dîza Sipî (Beyazîd) ê ji eşîra Xanî yane. Ji ber ku malbata wî, malmezinek bû, hêj di biçûkayiya Xanî de, bavê wî, ew daniye ber xwendinê. Li Medreseyan waneyên zanistî û li dîwanxanan jî waneyên cîhanî girtine. Mezin dibe û pileya xwendina wî pêşdikeve, ji bo fêrbûna xwendina Erebî diçe di nav feqan de, di wê demê de exbala herî mezin ew bû kesek bikare biçe nava feqan û fêrî Erebî bibe. Ehmedê Xanî li Bazîdê û derdora wê dixwîne, piştre diçe bajarê Ruha, Exlat û Bidlîsê zanistê fêr dibe. Piştre derbasî Qahîrê dibe, li Qahîrê di dibistana El Ezher de dixwîne û weke xwendekarek gelek serkeftî bawernameya vê zanîngehê bi dest têxe. Di heman cihî de, bi hebûn û jana gelê xwe dihese. Piştî dizivire Kurdistanê, li ser welatparêziyê kûr dibe. Ji bo bikaribe hestên welatparêziyê li Kurdistanê belav bike mewlûdekê dide û bi riya mewlûdê bi ciwanan re civînek ya amojgariyê pêktîne. Her wiha ji bo heman armancê ji çîroka Memê Alan, destana Mem û Zîn dafirîne. Dîsa li ser pêşxistina hevgirtin û xwenasîna Kurdan, gelek helbestan dinivîsîne.

Ehmedê Xanî, hêj di demê Kurd hişiyar nebûyî de, hêjatî û rûmeta wêje û zimanê xwe zaniye. Berhemên xwe bi zimanê Kurdî nivîsandine. Sedemê ku wê demê bi Kurdî nivîsandî jî wiha aniye ziman:

*"Xanî ji kemalê bêkemalî*
*Meydana kemalî dîtî xalî*
*Yanî ne ji qabil û xebîrî*
*Belkî bi teessûb û eşîrî"*

Xanî li sala 1707 çûye ber dilovaniya Yezdan.

Her li bajarê Beyazîdê hatiye veşartin. Gora wî weke dîtingehekê ye.

Ehmedê Xanî; di sedsala XVII'an de jiyaye.

Dema Xanî, demek wisa bû; Rojhilat ji rojava di hêla zanistê de pêşketîtir bû. Ewrupa lêgera derfetên çûna Asya digeriya. Di serdema Xanî de, rewşa Kurdistanê pir balkêş bû. Kurdistan li gor demê xwe yê derbasbûyî yê demê Îslamê di qonaxek herî bilind de bû. Her wekî Mîrên Kurdan li sala 1514'ê de sefawî ji xak û bajarên xwe derxistin. Li ser xaka Kurdistanê ji sed salan zêdetir şerê di navbera Osmanî û sefewiyan de domandiye. Ev şer ji beriya Xanî 11 salan, bi peymana bi navê Qesra Şîrîn ya di 1639'ê de çêbûyî û Kurdistan kirî dû parçe bi dawîbûye.

Ev dû parçebûn bû sedem di nava Mîr û Begên Kurdan de, nakokî û tevlîhevî çêbibin. Vê li hevnekirinê şopên mezin di ramanên Xanî yên çandî û welatparêzî de hiştine.

Ev bûyer dibin hevîrê ramanên Xanî û vê rewşê wiha dibîne.

*Wan girtî bi şûr şehrê Şuhret*
*Tesxirî kirin biladê hîmet*

*Her mêrekî wan bi bezlê Hatem*
*Her mêrekî wan bi remzê Rûstem*

*Bi fikirin ji Ereb heta ve Gurcan*
*Kurmanciye bûye Şuphê burcan*

*Ev Rum û  Ecem bi wan hesar in*
*Kurmancî hemî li çar kenar in*

*Her dû terefan qebîlê Kurmanc*
*Bo tîrê qeza kirine armanc*

*Goya ku li serhedan kilîd in*
*Her taîfe sedek in sedîd in*

*Ev qulzumê Rum û behrê Tacik*
*Hindî ku bikin xurûc û tehrik*

*Kurmanc dibin bi xûn muttex*
*Wan jêk vedikin misalê berzex*

**DAXUYANÎ**

Ehmedê Xanî nepejrîne ku Kurd bêxiret û ne wêrek in. Dibêje bajarê rûmetê bi şûr hatiye girtin. Welatê mezin, biçûk kirin. Her mêrekê wan bi camêriya xwe mîna Hatemê teyî, her mêrekî wan bi mêraniya xwe wekî Rûstemê Zal e.

Ka bala xwe bidê û bi hizire ku ji welatê Ereban heya van Gurcan, zimanê Kurdî bûye weke burcan. Kurd bûne sênca Rom û Eceman, Kurd li derdor in. Her dû alî jî Kurd ji bo tîr û kevanên xwe kirine armanc. Kurd li sînoran weke kîlîlan e. Her Eşîrek Kurd li ser tixubên wan weke bendavekê girtiye. Ev deryaya Tacîkistan û qelzûma Rûmê çiqas bikin derketin û tevgerê Kurd dinav xwînê dimînin. Kurdan weke berzexê ji hev dû cuda dikin.

Ger padîşahek me hebûya û tacek layêqî wî bidîta, ji bo wî textek bihata tedarîkirin, bi eşkereyî ji bo mejî bextek vedibû.

## Li ser vê Xanî wiha dinale:

***Kurmancî ne pir di bêkemal in***
***Emma di yetim û bêmecal in***

***Fil cumle ne cahil û nezan in***
***Belkî disefil û bê xwedan in***

***Ger dê hebûya me jî xudanek***
***Alî keremek letîfe danek***

# 2 Amadeyî Wêje

***İlm û huner û kemal û îz'an***
***Şî'r û xezel û kitab û dîwan***

***Ev cins bibûya li bal wî mamûl***
***Ev neqd bibûya li nik wî meqbûl***

***Min dê elema kemalê mewzûn***
***Alî bikira li banê gerdûn***

***Binavê ruha Melê Cizîrî***
***Pê hey bi kiriya Elî Herîrî***

***Kêfek we bida Feqiyê Teyran***
***Hetta bi ebed bimayî heyran.***

## DAXUYANÎ

Ehmedê Xanî, gelê Kurd ne bê qîmet in lê sêwî û bêderfet in. Demê niha weke gel ne nezanin belkî ji hev qûtbûyî û bêxwedî ne. Ger me jî xudanek hebûya û ew xudan, xwediyê camerî, qenciyek bilind bûya, zanist, huner, qîmet, rûmet, şîîr, xezel, kitêb, dîwan û ev li cem wî bihatana karanîn, ev tiştên amade li gel wî bihatana pejirandin, min dê alaya peyva mewzûn (gihandî) li banê Gerdûnê bi navê rihê Melayê Cizîrî bilind bikirba , pê Eliyê Herîrî sax kiriba, minê keyfek wisa bidaba Feqiyê Teyran ku heta dawî bimaba heyran.

**Berhemê Ehmedê Xanî**

1. Destana Mem û Zîn
2. Nûbihar
3. Eqîda Îmanê
4. Dîwana helbestan

**Peyv:**

**Şuhret**: Binav û deng
**Tesxir**:Biçûkbûyî
**Bilad**: Welat
**Hîmet**: hêz
**Remz**: Sembol
**Şuphê**: Mîna
**Hesar**: Sênc
**Sed**: bendav
**Sedîdî**: girtî
**Qulzum**: derya-okyanus
**Xuruç**: derketin
**Tehrîk** : beridandin-gurkirin
**Mutex**: gera xwînê de mayîn
**Bêkemal**: bêqîmet
**Bêmecal**:Bêderfet
**Sefîl**:Hejar
**Alî**: Bilind
**Kerem**: qencî
**Letîf**: dilnizmî, başî,zelal
**Mamûl**:tişta tê bikaranîn
**Meqbûl**:Pejirandin- erê kirin binirxe
**Ebedî**:bê dawî
**Mewzûn**:Gihandin
**Îz'an**:Meznahî
**Taîf**:Bir

ZANISTÊN WÊJEYÎ

## 5- Qafiya TAÇ

Wekheviya peyvên li dawiya rêzika helbestan ya ku yek di nava ya din de cih digre re qafiya taç tê gotin

Dema em temaşeyî malika li jêr dikin, dibînin ku peyva bûyî qafiya rêzika yekem ketiye nava peyva bûyî qafiya rêzika sêyem de û di nava wê de cih girtiye.

Mînak:

Şox û şengê zuhre **reng** ê → redîf
→ Q. Taç

Dil ji min bir dil ji min

Awirên heybet **pereng** ê → redîf
→ Q. Taç

Dil ji min bir dil ji min

**LÊKOLÎN**

1. Serdema Xanî têde dijiya, Kurdistan ji aliyê ramyarî ve di nava rewşek çawa de bû?
2. Berhemên herî binirx yê Xanî kîjan in?
3. Hûn jî li ser qafiya taç mînakekî peyda bikin

## HELBESTA ŞEREFXAN BIDLÎSÎ

Ez im weke gokê meydana Cîhanê
Beramber çarenûsê bêhêz û tuwanê

Bez û lez ji ber kaşû dikim rev
Ne arama min heye, bi roj ne xew bi şev

Bibîra min tê serpêhatiya jiyana min
Demeke dilxweş û sed car nexweş jiyana min

Ez zarok bûm, xwe negrî biçûk û sava
Binz dijiyam, di baweşa dê û bava

Li pişt dergûşê, min nekarî ez rabim
Gunehê min jî nebû, girêdidan destên min

Te tên (destên) min bihêz nebû bikin memik gîr
Devê min hîn dikir ji bo mijandina şîr

Bi ga û golikê bimeş birê dihatim
Ber bi pîr, ber bi pîrê dihatim



# 2 Amadeyî Wêje

Ji bahoz xwe diparast, bi dar û heta ber bi dar
Cî cî disekinim li vir û li wir, li wan aqar

Bilezî bûme wekî baz û pê gav
Ji xewa min xiste derbejn û laşê xav

Min dan destê mamoste ku hîn bim
Wekî berxek bixwîn û bişîr bim

Bûme dara bi darê wî ji zanînê
Li ber çavê min temên tarî hilanînê

Ji kul û kêmasî û tengiyan der çûm
Dersa xwendina seretayî zû bi ser çûm

Ez tevan hînbûm ji zanista diyarde
Hunermendekê renî hatim bijarde

## JÎNAMEYA ŞEREFXAN BIDLÎSÎ

Şerefxanê Bildîsî, di saa 1543’an de, li bajarokê Kerherudê ji dayîk bûye. Weke Şeref hat binav kirin. Piştî ku deshilatdariya bajarê Bidlîsê da ser milê xwe, nasnavê Xan jî bi navê wî ve hat danîn û bû Şerefxan. Kerherud bajarokekê girêdayî bajarê Qumê ye. Dayîka wî keça Emîrxan e, Emîrxan kesek navdar û ji malbatek hêja û ji malemezinên Kerherudê ye. Navê bavê wî Şemsedîn bû. Şemsedîn deshilatê herêma Bidlîsê bû. Ji malbata Şerefxan û kurê Şerefxan bû.



Şerefxan zarokatiya xwe li bajarokê Kerherudê di nav zarokên malxala de derbas dike. Li wê derê dibistana seretayî dixwîne, piştî dibistana seretayî sê salan Şah Tehmasbe di temenê nehan dibe seraya xwe. Di dibistana Humayun de, bi zarokên xwe re dide xwendin. Di nav zarokên Sarayê de dibe mirovek pêşeng. Di sala 1555’an de bavê wî dev ji erkê xwe yê mezinatiya eşîra Rojkan berdide. Li ser daxwaza eşîra Rojkan Şah Tehmasbê yê mezin Şerefxan di temenê 12’e salî de wî li şûna bavê wî dike fermandar.

Vê fermandariya wî sê salan domand. Gel jî pir jê qayîl bû. Piştî sê salan Şah ew rêkir Bajarê Hemedanê cem xalê wî.

# 2 Amadeyî Wêje

Piştî aloziyên di navbera wî û Şah de derketin; di sala 1579'an de bi alîkariya Begên Kurd derbasî bajarê Wanê bû. Piştî têkîlî danîna bi Osmaniyan re, ji aliyê Osmaniyan ve mezinatiya Bidlîsê tê radest kirin û derbasî Bidlîsê dibe. Li ser textê Bapîrê xwe Şerefxan dirûne.

Di demê fermandariya xwe de bi karê nivîskariyê ve xerîk dibe û gelek berhemên hêja dinivîsîne.

Şerefxan di 61 salîya xwe de, di sala 1604'an de li bajarê Bidlîsê koça dawî dike û li goristana malbatê tê veşartin.

Berhemên Şerefxan:

Li ser dîroka Kurdistanê: Şerefname

Dîwana helbestan

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

Ji wekheviya dû peyv yan jî pêvekên di heman wate û erkî de dikevin piştî qafiyaya rêzikên helbestan re redîf tê gotin. Di demên dawî de, hinek nivîska ahengiya helbestê bes bi redîfê çêdikin û her çi qas redîf di wateya xwe de qafiyeya piştî qafiyêyê jî be qafiyê bikaranîne.

Redîf di nava xwe de dibe sê beş:

**1.Redîfa bi peyvê çêdibe:**

Ew redîfa ku peyvan çêdibeye.

Mînak:

Ji kul û kêmasî û tengiyan d**er** çûm → Redîf

→ Qafiye

Dersa xwendina seretayî zû bi s**er** çûm → Redîf

→ Qafiye

**LÊKOLÎN**

1.Malika duwem ya helbesta li jor şîrove bikin.

2.Şerefxanê Bidlîsî di kîjan salê de bûye fermandar?

3.Gelo ger du peyvên wekhev hebin lê pêşiya wan qafiye nebe; dibin redîf? Çima?

## BERXWEDANA WÊJEYA KURDÎ



Em dixwazin li ser pêşketina ziman, çandê û bandora wêya li ser wêjeya klasîk ya Kurdî rawestin. Tê zanîn ku di pêşketina ziman û çandê de, bandora herî mezin, civak bûne. Ji aliyê din jî hebûna saziyên navendî, li ser pêşketina ziman û çandê bandorekî mezin dikin. Mixabin, Kurd di vî alî de bêşans bûn. Dema Selehaddînî Eyyûbî ne têde, di nav van hezar salî de ti dewletekî Kurda çênebûye. Di dema Eyyûbî de jî zanayên Kurdan bi piranî ji olê Islamê re xebitîne; ev yek li ser wêjeya Kurdî bandorek negatîf nekiribe jî bandorek pozîtîf jî nekiriye. Ji ber bandora olê Islamê, klasîkên dema Eyyûbiyan her çiqas di nav wan de yên bi Kurdî jî hebin, bi piranî Erebî ne. Ji bilî vê yekê belavbûnê jî, Kurd girtine bin bandora xwe. Mirov dikare serdestiya zimanê Erebî û Farisî ku di klasîkên Kurdî de jî vê serdestiya bi eşkere bibîne. Ji sedsala 10'an heta îro, ev bandora dewletên serdest û zimanê wan hêjî li ser ziman û

çanda Kurdî astengek mezin e. Heta gelek kesên navdar ku Kurd in, ji ber vê bandorê bi Kurdî nenivîsandine; berhemên xwe jî bi piranî Erebî, Farisî û Tirkî afirandine. Wekî mînak; Ebûl Feda, Ibn'ul Esîr û Ibn Xelîkan bi Erebî; Şeref Xan û Mewlana Xalid bi Farisî û yên wekî Nefî û Nabî jî bi Tirkî nivîsandine. Iro jî gelek Kurdên navdar hene ku bi Tirkî, Erebî yan jî bi Farisî dinivîsînin.

Ev yek tenê bi zexeliya Kurdan nayê şirovekirin. Belkî deshilatdarên Kurdistanê bi riyên cûr be cûr bandor li ziman û wêjeya Kurdî kirine. Her wiha tinebûna saziyên navendî û zimanê olê Islamê, ango Erebî jî bandorekî negatîf li ser ziman, wêje û çanda Kurdî çêkiriye. Lê Kurdan li hember hemû bandorên negatîf, ziman û çanda xwe parastine û di sedsala XVIII'an de ev hewldana pêşxistin û parastina ziman, wêje û çanda xwe gihandine astek nû.

**LÊKOLÎN**

1.Çima ziman û wêjeya Kurdî di demê Îslamê de gavên pêwîst nekarî bavêjin?

2.Ji bo ku em bikaribin ziman û wêjeya xwe pêşbêxin pêwîstiya me bi çi heye?

## HELBESTA MELE MENSURÊ GILGAŞÎ

***Cûbar û bax û bostan kamil bibûn tevave***
***Şehlûl û endelî bûn meşayane hatne nave***
***Cewap bibine reqîban mal nêrgiza xunave***

***Nêrgiz bişkûv daye sosin hem xurûş e***
***Lale pir cefaye sumbul bi qaba pûş e***
***Biharekî elaye sosin zêrîn gurûş e***

***Sosin dinav baxan zar zor digrin xunavî***
***Nêrgizî ser çeqande qedeh pir ji navî***
***Sîmen wereq nîşan da eksê li neqşê avî***

***Neqişkirin cûbar bila çû werda erxder***
***Senûber û gulbihar kulîlkên mû enber***
***Gulşelîl û lalezar nîsan kîn da ehmer***

## JÎNAMEYA MELA MENSURÊ GILGAŞÎ



Navê vî helbestvanê me Mensur e, kurê mele Ehmedê Gilgaşî ye. Li gorî çavkaniyên di destê me de ew di sala 1783'an de li gundê Gilgaşê ji dayîk bûye. Gilgaş, gundek biçûke ku dikeve rojhilatê bajarê Amedê. Mensûr di zarokatiya xwe de li cem bavê xwe dixwîne. Piştre çûye Hucreya Feqeyan û ji bo xwendinê li gelek herêmên Kurdistanê geriyaye. Demekê li Amedê xwendiye. Xwendina xwe li Bidlîsê bi dawî kiriye. Gilgaşî temenê xwe yê mayî bi dayîna wane û rê nîşandana gel ve derbas kiriye.

Di şêst û sê saliya xwe de, di sala 1846'e de koça dawî kiriye û li Gilgaşê sipartine axê.

Mele Mensur, weke yek ji helbestvanên herî berz tê jimartin. Ew di ristin û hûnandina helbestên evînî, olî û xwezayî de xwediyê hizirek berz û pêşketî bû.

Wisa diyar e ku Mele Mensur jî weke piraniya helbestvanên din evîndarê xweşikbûna xwezayiya herêma xwe bû. Vê yekê deriyê hûnandina helbestê jêre vekiriye.

Di despêka her helbestek ya xwe de dabaşa xweşikbûna bihar û xwezaya Kurdistanê kiriye.

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

**2.Redîfa bi pêvekan pêktê:**

Ew redîfa ku ji pêvekan pêktê ye.

Mînak:

Nêrgiz bişkûv daye sosin hem xur**ûş** e → redîfa bi pêvekê → Q. tam

Lale pir cefaye sumbul bi qaba p**ûş** e → redîfa bi pêvekê → Q. tam

Biharekî elaye sosin zêrîn gur**ûş** e → redîfa bi pêvekê → Q. tam

**3. Redîfa birepeyv**

Li dawiya rêzikên helbestan, birepeyvên di heman wateyê yan heman erkî de ji bo ahengiyê tên bikaranîn re redîfa birepeyvan tê gotin.

## LÊKOLÎN

1.Mele Mensur kengê û li kûderê hatiye Cîhanê û helbestên xwe li ser çi nivîsandine?

2.Redîf dibe çend beş û li ser her yekê mînakekê sazbikin?

## XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1.Çima Nalî weke despêkirina wêjeya herêma Soran tê pejirandin?

2.Nalî çima navê Nalî li xwe kiriye?

## HELBESTA NALÎ

Mûy spî kirdim be şûştim avî eynî şor û şet
Şor e şet yeinê ket ê de xo qelb û be bet

Helgira, wek momî kafûrî beşew da mû be mûm im
Wa siyarû bû be xwênim nuqte nuqte xet bi xet

Min delêm şew bû be roj nefsim delê roj bû be şew
Ew musîbe çunke çawî pê spî bû min xelet

Rewxenî dide rijaye serkitabî xetî xom
Çaw le îşî ew spî nûriş be ser ew da seqet

Sard û germ e ahekem sewzegiyay kirdim be pûş
Payîz rû bû be burdî sûr û zerdî muxtelît

Wechekem îsmî beyaz ema wereq zerd û siya
Ba muxetet bê be kafûrî keşîdey xoş nemet

Çunke lewhî rû siyah rûzerdî bê tezînî ye
Xwênî çawim cedwelî bê qetre kanîşî nuqte

Neqşî du mûyî bedewrî rû debête eybî şeyb
Ayeney rûpakî ye, rûnakî ye, nûr û şemet

Ya gedayek e xenî ya padîşahêk e feqîr
Lem duwe xalî nî ye (Nalî) le rûy hedî weset


**DAXUYANÎ**

**Wate**: Rondikên çavên min, hatine li ser mûyên reşê rûyê min. Hemû wekî qeleyên reş ku ketibin nava livîn û bizivînê û bibin qazeke spî mûyên min yên reş wekî şevereşê bû. Çi niha wekî rojê spî bûne. Ez ji nefsa xwe ya tamakar û serkêş re dibêjim, êdî ewqas hewa û hewes bes e. Vaye mûyên min yên reş jî spî bûn. Dema pîrîtiyê hatiye. Lê belê ji ber ku ew kurê dahatûyê ye û ji bilî reşatiyê tiştek din nabîne. Di bersivê de dibêje: "na wisa nîne, mûyên spî reş bûne." Xwîna çavên min li cihê rondikan li ser çavên min de rijiyaye. Vêca çavên min ji ber êş û jana rijiyana vê xwînê, dîtina xwe ji dest daye. Ji ber wê reşahiya çavên min, nikarin tiştekê bibînin. Yanî çavên min bi giştî ronahiya xwe ji dest dane û ez kûr bûme.

Her wiha dema di payîzê de rengê pelên daran zer û sor dibin, bayê pîrîtiyê jî rengê rûyê min bi rondikan ji xwînê zer û sor kiriye. Wekî Kurkê Yemenî rengê min zer û sor bûye. Her çend ku di rastiyê de spî ye lê belê bi pelên zer, reş û xwînê hatiye pûşandin û girtin. Mûyên min yên spî jî ku wekî kafûrê bû ciwaniyê û xweşikiyê xet xetî kiriye. Ger zer bi pêşdariya rûreşiyê ve hebe, dibe sedema ciwanî û hêjayî yê. Ger mûyên rûyê mirov maş û birinc bin, dû rengiya pîrîtiyê radigihîne û nîşan dide. Ji ber ku bi giştî dibe awêneya rû pakiyê. Maş û birinc jî dibe nîşane û awêneya ronahî yê.

## JÎNAMEYA NALÎ

Navê Nalî Mele Xidirê kûrê Ehmedê Şaweysê Mikaîlî ye, Nalî bixwe nasnavê wî ye. Li ser dîroka dayîkbûna wî gelek nêrîn hene lê li gor Eleđîn Secadî Ev wêjevan li sala 1797'ê li Şarezorê, gundê Qeredaxê ji dayîk bûye. Xwendina xwe ya seretayî li Silêmaniyê, li cem Mela Ebdileres despêkiriye, diçe Xaneqa Mewlana Xalid, piştre diçe Şamê û du-sê salan li wê derê dimîne. Li wê derê bêriya Silêmaniyê dike û helbestek binavê "Qurbana hindek rêyan de bin".... Ji Şamê diçe Stenbolê û li wê derê gir gireyên Kurdan nasdike, dibe nasê Ehmed paşayê Baban û di derbarê wî de helbestek Kurdewarî binavê "Ta felek dewir neda ser kewkeba wî avanebû" dinivîse.



Wêjenasê Kurd, Elaedîn Secadî, Gêwî Mukriyanî û Meirûf Xeznewî û yên din, Nalî weke pêşengvanê wêjeya kevnara Başûrê Kurdistanê dibînin. Nalî weke gelek wêjevanê demê xwe evîndarê xweşikbûna welatê xwe bûye. Her çiqas di helbestên wî de navê hebîbe wek evîndarekê bê dîtin jî lê em bawer dikin peyva hebîbe ya ku di wateya evînê de ye, ji bo evîndariya welatê xwe bikaraniye.

Helbestên Nalî bi piranî helbestên têkel in, hem dildarî ne hem welatparêzî ne. Ji ber êşa dildariya welatparêziya

xwe û neyekbûyîna gelê xwe, wî nasnavê xwe kiriye Nalî. Nalî li sala 1855'ê çûye ber dilovaniya Yezdan. Dîwanek ya helbestan li şûn xwe ve hêlaye. Lê mixabin gelek helbestên wî yên hêja û binirx hene ku di dîwanê de cih nagrin.

**ZANISTÊN WÊJEYÎ**

## SAZÛMANIYA QAFIYÊ

Ji nîşandana bi tîpan ya qafiya rêzikên helbestekê re sazûmaniya qafiyê tê gotin.

Qafiye li gorr sazûmaniya xwe dibe pênç beş:

1.Qafiya Rast: Qafiya hemû rêzikên malika helbestê wekhev e.

Lê belê ger di malikê de rêzika dibe nakarat hebe, dibe qafiya wê rêzikê cuda be.

**"aa/bb/cc…" ; "aaaa/bbbb/cccc/….";  "aaab/cccb/dddb/…"**

***<u>Mînak</u>***:

Mûy spî kirdim be şûştim avî eynî şor û şet → a
Şor e şet yeinê ket ê de xo qelb û be bet → a

**Nalî**

Wê şepalê misk û xalê → a
Dêm dûrê gerden şepalê → a
Cebheta biska semalê → a
Dil ji min bir dil ji min → b

Zilf û xalan nûn û dalan → a
Wan ji min dil bir bitalan → a
Goşeyê qewsê hilalan → a
Dil ji min bir dil ji min → b

***<u>Melayê Cizîrî</u>***

**LÊKOLÎN**

1.Nalî li kûderê hatiye Cîhanê?


2.Hûn jî jînameyek ya wêjevanê mîna Nalî binivîsin.


# XEBATÊN AMADEKARIYÊ

1.Herikînên wêjeyên Cîhanê bandorek çawa li ser wêjeya Kurdî kirine?

2.Hûn jî çend herikînên wêjeyî lêkolîn bikin?

## TÊKÎLIYÊN DI NAVBERA HERIKÎNA WÊJE Û HERIKÎNA HIZIRÊ DE





Gelek nivîskar û helbestvan yan bûne pêşengê herikînek hizirî yan di nava herikînek hizirî de cih girtine. Wêjevan di heman demê de mirovên hizirîne. Bi derketin û pêşketina hizirê re wêje jî pêşket. Di zimanê me de ji ber ku wêje xwediyê bingehek dewlemend e; ev rewş zûtir pêkhat. Li aliyê din, guhartin û pêşketinên wêjeya Cîhanî jî bandorekê erênî li ser pêşketina wêjeya Kurdî jî kir.

Ka çawa di nîvê sedsala XVII'an de ronesansê rê li ber derketina klasîzmê vekir, li hemberî derketina klasîzmê romantîzm; li hemberî romantîzmê realîzm birêzê ve natûralzîm, panralîzm derketin holê. Li hemberî van herikînên wêjeyî sembolîzm derket holê. Bi vî rengî bi derketina her herikînek hizirî re pêşketin jî di wêjeya me de jî pêkhat.

## KLASÎZM

Klasîzma ku bi bandora ronesansê derketî, bandorek li ser wêjeyê çêkir. Klasîzm berhemên kevin yên bi wêjeyê ve girêdayî digre dest . Piraniya xwe berhemên olan yên despêkê, ne bi navê klasîzmê bi awayek xwezayî hatine bikaranîn. Lê ekola klasîzm di cîhanê de piranîya xwe di S.S 16,17 û 18'an de pêşketiye .Nivîskarên cîhanê yên kevin berhemên xwe pêşkêş kirine. Damezrênerê herikîna klasîzmê nivîskar Boîleao ye. Di van sedsalan de jî gelek nivîskarên navdar yên weke Shekspîr, Dantêa,Tolstoy, Dastovîkî û hwd, di van s.s de hozanvanên Kurd yên weke Ehmedê Xanî,Feqiyê Teyran û Melayê Cizîrî jiyane. Berhemên van wêjevanê Kurd yên kevnar bûne bingehê klasîzma Rojhilata Navîn. Ev wêjevanên Kurd yên kevnar berhemên xwe yên wêjeyiyên klasîk ji beriya derketina klasîzma Ewrûpa derxistine holê. Em bawer in, ji xwe klasîzma bi derketina ronesansê derketî jî ji klasîzma Rojhilata Navîn bandor bûye.

Bername û şêweyên dibin sedemê geşkirina klasizmê evin:

- Girîngiyê dide hişmendî û xwezayê.
- Taybetmendiya hunermendên klasizmê berî her tiştî girînigiyê didin ziman û awayek tekûz.
- Hunermed di berhemên xwe de nêrînên kesî veşartî dihêle. Li gel wî ya girîng hişmendî û pîvan e.
- Di şanoyê de yekbûna sê tiştan girîng e; dem, cih û bûyer.
- Tirajêdî li ser hoy û exlaqê paqij tê avakirin.
- Hunermendên wêjeyê kesên bijare û di cih de digre dest.

**LÊKOLÎN**

1.Klasîzm kengî derketiye?
2.Armanca klasîzmê çiye?

## ROMANTIZM

Romatîzm li Fransê di sala 1830'ê de pêşketiye, wek reaksîyona li dijî Klasîzmê derketiye holê.

Li gorî parêzvanên romantîzmê ji kesên dilpak xirabî çênabin. Dîsa li gor wan li cîhanê xirabî tinebe dê cîhan gelek xweş be; wê demê dê mirov bextîyar bibin. Gelek nivîskarên navdar yên weke Godhave (Almanî), Lond Byron (İngilîzî),Vîctor Hogo (Fransî), romantîzm dane herikandin. Romantîzm peyvek Almanî ye. Ji (Dîe

Romantîk) hatiye pêkanîn. Bi taybet bi afrandina berhemên Vîctor Hogo hêj bêhtir xurt bûye. Romantîzm berhemên civakê digre dest û bi hest û xiyalan dixemilîne û pêşkêşî civakê dike. Li gor romantîzmê, xweşikbûn ji berîya her tiştî tê. Bi vê boneyê girîngiyek gelek mezin dide li ser xweşikbûna hest û xiyalan.

Rêgezên wê yên bingehîn ev in:

1.Bingehê Romantîzmê hest û xiyal in. Romantîzm li ser bingehê hest û xiyalan yan jî bi dilşadbûnê tê.

2.Mijarên xwe ji dîrok, çanda gel û wêjeya hemdem digre. Hunermend di berhemên xwe de evîndarî, xweza û mirinê rave dikin.

3.Giyanê mirovan çareser dike, ji rewşên belav, bêbawer û tevil hev sûd digre dest.

4.Ne weke klasîzmê aliyekê, tevayî aliyan dire dest.

5.Bûyerên bixwîn û kirêt li ser dikê nîşa dike.

6.Girîngiyê dide bikaranîna jiyana gelî û herêmî. Ne kesê bijare lê kesê ji rêz di nava civakê de dijî dihilbijêre.

7.Hunermendên vê herikînê civakîne û wekheviyê diparêzin.

**LÊKOLÎN**

1. Romantîzm li ser çi armancê tê avakirin?

## REALIZM

Realîzm di sedsala XIX'an de çêbûye. Realizm herikandina wêjeyî ya bi rastiyê ve girêdayî, heta tê wateya rastiyê jî. Realizm dixwaze nivîskarê wê jiyanê her wek heyî bigre dest û guhertinê li gel wê çêneke. Li gor Realîzm di vê nivîskar rast be. Divê li ser hîmê rastiyê tevbigerin. Ne ku li ser xiyala be. Balzac, Gustav Flober, Standal û w.k.d. nivîskarê navdar yên pêşevan û parêzvanên herikandina realizmê ne.

Rêgezên Realîzmê

1.Girîngiyê dide belge û çavnêriyan.

2. Di jiyana rojane de, bûyerên rastî çêbûyî û mirovên di wan bûyeran de cih girtî weke heyî dide têgihandin.

3. Wêneyîkirina hawîrdor, têgihandina toreyên civakî girîngiyê qezenç dikin. Li gel wêneyîkirinê bûyer bêwate dibe.

4.Nivîskar nêrînên xwe yên kesî diveşêre. Bûyer û lehengên bûyerê bi awayekî bê alî dide têgihandin.

5. Armanca hîndekariyê nîne. Huner ji bo hunerê ye.

6. Di têgihandina bûyeran de, têkîliyên sedem û encamê bingeh digire.

7.Uslûbê wê vekirî û ne ji ber xwe ve çêkiriye.

## PARNASÎZM

Parnasîzma, di helbestê de tê wateya realîzmê. Di encama nerazîbûna li hemberî romantîzmê de derketiye.

Rêgezên wê:

## 2 Amadeyî Wêje

1. Di helbestan de destûrên realîzmê û natûralîzmê hawêj dike.

2. Ji hestan zêdetir girîngiyê dide wêneyîkirin, hizirîn, awayê vegotinên xweşik.

## NATURALIM

Naturalîzim herikandinekî wêjeyî di sedsala XIX'an de, li Fransayê despêkiriye. Rêveberê herikandina Naturalîzmê Emîle Zola ye, Naturalîzm û Realizm wek hev tên hesibandin .Li gor Naturalîzmê her tişt bi mirov û bûyerên xwezayî ve girêdayî ye. Bi taybet li ser bingehê rastiyê hatiye avakirin. Li gorî Felsefê li ser bingehê Meteryalîzmê bilind bûye.

Rêgezên wê:

1. Ev herikîn awayek zêdeker yê realîzmê ye.
2. Hunermendên wê, bûyer û kesan bi çavê kesê zana lêkolîn dike û ji têgihandina aliyên wan yê xirab jî nareve.
3. Nivîskar ji rêgezên bûyerên biyolojîk yên weke sedem û encamek diyar dikeve rê û vê di wêjeyê de pêktîne.
4. Destûra ku dibêjin huner qopyaya xwezayê ye, hawêj dike.
5. Li gel nivîskarê wê lêhatina tov, bandora hawîrdor ya li ser mergê mirov; pesertina taqîkirinê û çavdêrîkirin girîng in.

## SEMBOLÎZM

Sembolîzm, di sedsala XIX'an de, di encama nerazîbûnên realizm, naturalizm û parnasîzmê de derketiye holê. ev herikandina wêjeyî pîranî li ser awênê helbestê tê bikaranîn. Nivîskarê sembolîst ji eşkeretiyê direvin. Ew girîngîyê didin li ser gotinên mecazî. Li gor wan xweşikbûn

û rindî ji eşkeretiyê hes nakin. Lewma jî divê bi mecazan bê nixûmandin û xemilandin.

Li gor sembolîstvanan divê her kes bi sembolekê bê nîşakirin. Wek al sembola welat e. pênûs jî sembola zanînêye.

Rêgezên wê:

1.Nerastiya helbestê, rastiyên em pêdihesin bi me dide têgihandin.

2.Helbest li ser sembolan tê avakirin.

3.Di helbestê de muzîk ji her tiştî girîngtir e.

4.Xweşikbûn ne di vekirîbûnê de ye, di girtîbûnê de ye.

5.Helbestvanên wê ji welatê xiyalî hes dikin.

6.Zêdebûnek serbest û hûnandinek serbest bikartîne.

7.Rêziman, rastnivîs û hêmandanîn li gor helbestvan di helbestê de cih digrin.

## DI WÊJEYA KURDÎ DE ROMANTÎZM Û SEMBOLÎZM

Jiyana Kurdan romantik e. Jiyana her Kurdekê dikare bibe romanek romantîk. Di berhemên wêjeya Kurdî yên klasîk û hemdem de, romantîzm cihekî girîng digre. Di wêjeya Kurdî de Sembolîzm jî cihekî xwe yê diyar heye. Gelek berhemên wêjeya Kurdî bi romantîzm û sembolîzmê hatine nexşandin. Her çiqas sembolîzm û romantîzm piştî salên 1800'ê li Ewrûpayê weke herikandinên wêjeyî derketibin holê jî, lê beriya wê demê jî di berhemê wêjeya Kurdî de, ne li gor vî navî jî be, bi heman wateyê romantîzm û sembolîzm hebûna xwe daye diyar kirin. Di Destana Rustemê Zal, Mem û Zîn, Dîwanên Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran de hem sembol û hem jî romantîzm heye. Bi taybet destana Mem û Zînê bi gelek sembolan hatiye hûnandin. Di hinek berhemên wêjeyî de lawirên cûr be cûr wek sembolê tên nîşandan mînak: mar, kevok, kew û wkd. Ehmedê Xanî hinek mirov wek sembol nîşan dane.Wek Mem: Gelê Kurd, Zîn jî Kurdistanê sembole dike. Mem û Zîn sembola evînê ne. Sembola evîna welatperwerîyê ne. Beko jî sembola xirabîyê ye.Tajdin û Arif jî sembola dostanî, hevkarî û alîkarîyê ne. Evîna Memû Zîn, evînek Romantîke. Ekolên wêjeyî yên navnetewî di nava Kurdan de tine ne. Di bandora herikandina wêjeya Kurdî de bi fermî ekolên wêjeyî ne hatine bikaranîn. Lê di bingehê xwe de van ekolan di nava xwe de dihewîne.

## LÊKOLÎN

1. Wêjevanên Kurd sembolîzm çawa di nav wêjeya Kurdan de bikaraniye?
2. Sembolîzm çiye?
3. Romantîzm çiye?

## HELBESTA SELÎM SILÊMAN

Destana Usif û Zelîxa

Ema bi sedat û bi envan
Behsê bikin em ji pîrê kenan

Ev reng ji axretê di mezherî
Usif bi cemal bûye meşhûrî

Xwîna xwe ji bo mêran beyan ke
Tek qerîr bike li me eyan ke

Yaqûp wî hebû keçekî xeber saz
Wextê ji peder bihîst ev raz

Beyt bi me re koh û çiyan
Reh şihhetê tayrekî bihiştan

## JÎNAMEYA SELÎM SILÊMAN



Selîm Silêman li sala 1586'ê li Hîzana Amedê ji dayîk bûye. Selîm helbestvan û wêjevanekî dîrokî ye. Di nav wêjekarên di demê xwe de cihekî tekûz girtiye. Di nav gel dabaşa gelek berhemên wî tên kirin lê mixabin ji berhemên wî di destê me de tenê destana Yusiv û Zelîxa heye. Her wiha dîwanek ya wî û li gel hinek helbestên Xezelî hene.

Di demê zarokatiya xwe de helbest ji devê kesan digirtin û bi awazek xweş distrand. Di nava gel de weke Selîm tê naskirin lê wî di helbestên xwe de, navê xwe weke Ehmed daye nasîn.  Qanatê Kurdo jî, vî hozanvanê me weke Selîm Silêman binav dike.

Lewra di arşîva mûzeya Moskovayê de ev malika helbesta wî tê dîtin:

"Selîm dil men Silêmanî m
Esîrê mirê Xîzani m"

Weke di belgeyên di destê me de heyî Selîm hemdemê Şerefxanê Bidlîsê ye.

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

2. Qafiya Pêçayî

Di vê qafiyê de wekheviya dengên li dawiya rêzika yekem ya helbestê û ya çarem de pêwîst e û her wiha tê xwestin ku qafiya rêzika duwem û sêyem heman be.

Ev tê wateya: abba/cddc/effe…

Mînak:

Daîm diçî dengê te tê→ a

Dengê te tê bi roj û şev→ b

Pêl radibin ji mewcê kev→ b

Seyrane ji rengê qudretê → a

a

## LÊKOLÎN

1.Selîm Silêman hemdemêkê ye?

2.Hûn jî malikek ya qafiyeya pêçayî peyda bikin û bi şema nîşa bikin.

## JÎNAMEYA MIRADXANÊ BEYAZÎDÎ



Miradxanê Beyazîdî di sala 1743’ê zayînî de li bajarê Beyazîda kevin ji dayîk bûye. Berî ku em derbarê Miradxan de agahiyan bidin, em ji bajarê wî Bazîdê hinekî agahiyan bidin û rola vî bajarî ya di warê wêjevanên Kurd de bizanibin. Bazîd di dîroka wêjeya Kurd de taybetiyeke xwe heye. Di Medreseya Bazîdê de gelek helbestvan û wêjevanên Kurd gihîştine. Kurdan ev bajar bi navê Bazîdaxa yan jî bi kurtayî Bazîd binav kirine. Lê Tirkan navê bajar weke hemû gund û bajarên Kurdistanê guhertine û kirine Doxubeyazît.

Bazîd bajarekî Kurdistanê yê gelekî kevnare ye. Dikeve Başûrê rojavayê Çiyayê Agirî. Ev bajarê kevin di geliyekî teng de ye û bi pênc kîlometreyan dûrî bajarê nû ye. Xirbeyên Seraya Ishaq Paşa di navbera her du bajaran de cih digirin. Piştî şerê cîhanê yê duyemîn bajarê nû pêşket û bajarê kevin hat roxandin.

Taybetmendiya Bazîdê ji bo Kurdan ev e ku piştî Ehmedê Xanî li wir cîwar bû, êdî bajar bû navendeke çand û wêjeya Kurdî. Gelek wêjevan, helbestvan û nivîskarên Kurd di Medreseya Ehmedê Xanî de gihiştin. Ji çend kesên

navdar yên ku di vê Medreseyê de xwendin û bi nav û deng bûn, yek jî, Mirad Xan e. Di gel Mirad Xan helbestvan ê wêjevanên din ku di Medreseya Bazîdê de gihiştin ev in: Îsmayîlê Bazîdî, Mele Mahmûdê Bazîdî û Xelîfe Yûsiv.

Li Medreseya Bazîdê, ku Ehmedê Xanî pirtûkxaneyek mezin tê de vekiribû, Mirad Xan jî mîna gelek hevdemên xwe, xwend û ji vê pirtûkxaneya Ehmedê Xanî sûdek mezin wergirt.

Zarokatiya xwe di heman bajarî de bûrandiye. Di temenê şeşan de dest bi xwendina Quranê kiriye. Piştî wê bê rawestan li Medreseya Ehmedê Xanî ya Bazîdê de dest bi xwendina zanistên olî, wêjeyî û teknîkî kiriye. Piştre li hemû navçêyên Bazîd, Hekarî, Wan û Bidlîsê digere. Di wê gera xwe de, medreseyên ku keyfa wî ji tekûziya wan re dihat yan jî dema rasta Seydayek zana dihat, li wir demekê dima û dixwend.

Bi vî awayî kêmasiyên xwe û kêmasiyên xwendina xwe dirûst dikir. Bi van xebatên xwe yên giranbiha, di temenê xortaniya xwe de bû zana, hosta û hozanvanek mezin. Armanca wî hozanvanî ew bû ku bikeve riya Ehmedê Xanî. Helbesta binivîse û dema daxwaz hebe, di civatan de bixwîne. Ji ber vê çendê jiyana Ehmedê Xanî lêkolîn dike.

Ji her tiştî zêdetir keyfa wî ji nivîsandina helbest, destan û xwendina wan re dihat.

Gelek berhemên wî yên giranbiha hene lê berhemên wî yên di destê me de heyî; ji dîwana wî çend malikên helbestan û destana Zembîlfiroş heye. Di derbarê demê nivîsandina destana Zembîlfiroş de wiha nivîsandiye:

"Sed û nehwêd sal bûriye
Paşê hezara hicri ye
Miradxan dibê Serhatiye
Bi şiir û bi gotinekê xweş"

Bi awayî hozanvanê me dibêje: "Min ev destan sala 1190'ê koçî, beramberî 1776'ê zayînî nivîsandiye."

Miradxan destana Zembîlfiroş bi 254 malikan temam kiriye.

Li gor hinek nivîskaran Miradxan di navbera salên 1737-1785'an de jiyaye.

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

3.Qafiyeya Çeprast

Di vê qafiyê de wekheviya dengên li dawiya rêzika yekem ya helbestê û ya sêyem de pêwîst e û her wiha tê xwestin ku qafiya rêzika duwem û çarem heman be.

Ev tê wateya: abab/cdcd/efef…

Mînak:

Hêj ji min dil heriş**and** ê→ Redîf
→ a

Sotiyê arê te me→ redîf
→ b

Hiş û aqil şewiş**and** ê→ Redîf
→ a

Sews û bîm**arê** te me→ redîf
→ b

***Osman Sebrî***

## LÊKOLÎN

1. Çima Miradxan jiyana Ehmedê Xanî lêkolîn kir?
2. Hûn jî malikekê peyda bikin û şemaya wê diyar bikin.

## HELBESTA MELE XELÎLÊ SÊRTÎ

Melek ji bo wî hene bê edet
Mudamî îbadet dikin bê medet

Hinek jê xewasin welê her yekî
Vebûhtî kirî ew ji bo şolekî

Enasir çi harin ji wanin melek
Wekî ins û cin nûre qismê gelek


Di wan û di me ax û cinan hewa
Di şeytanî nar e ewê bênewa

Ne mêr û ne jin bêxwer û vexwerin
Li şiklan û qadir bi çeng û berin

Fena dê bibin ew biçin cenetê
Ji bo ehlê wê re bikin xizmetê

## JINAMEYA MELE XELÎLÊ SÊRTÎ

Mele Xelîlê Sêrtî, li sala 1754’ê zayînî li gundê Gulpika girêdayî Hêzana navçeya Bidlîsê ji dayîk bûye.



Ev gund dikeve bakûrê navçeyê. Ji wî gundî gelek kesên zana û egîd rabûne û Mele Xelîl jî yek ji wan e. Navê bavê wî Mele Hesenê Mele Xalid e. Ji malbata Mele Xelîl re digotin; Mala Melan. Lê mixabin ev gundê hêja ber bi wêranbûne ve diçe. Mele Xelîl di heman gundî de mezin dibe. Hêj di zarokatiya wî de, dabaşa hiş û bîra wî di civatan de tê kirin.

Her tim tevlî cıvata kesên ji xwe mezintir dibû û gel li ser vê rewşa wî dipeyvî. Li cem bavê xwe dest bi xwendina Quranê kir. Piştî wê dest avête xwendina pirtûkên Fiqihê. Ew jî weke hemû xwendekarên wê demê li hucreyên cûr be cûr digere û li cem zanayên cûr be cûr dixwîne. Xwendina xwe li gel seydayê Mezin, Miftî Mele Mehmûdê Behdînî qedand û destûrnameya xwe stand.

Her çiqas di nava gel weke Mele Xelîlê Sêrtî hatibû naskirin jî lê wî di helbestên xwe de xwe weke Xelîl daye naskirin.

Mele Xelîl li sala 1843’ê zayînî di temenê 89 saliya xwe de koça dawî kiriye.

Mele Xelîl ji 30 pirtûka zêdetir nivîsandine. Lê di nava destê gel de tenê navê 25 pirtûkên wî hene. Pirtûka wî ya bi navê Nehculenan pirtûkek giranbiha ya wêjeya Kurdî ye.

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

4.Qafiya Puşandî

Di vê qafiyê de wekheviya dengên li dawiya rêzika yekem ya helbestê û ya sêyem de pêwîst e. Ev qafiye bi awayek giştî di malikên sêtik de çêdibe.

Ev tê wateya: aba/cdc/efe…

Mînak:

Hero hayê hero hay**ê** → a

Hero hayê ha gidî cano → b

Heman wernê dan kutan**ê** → a

## LÊKOLÎN

1. Berhemek ya Mele Xelîl peyda bikin.

2.Hûn jî malikekê sê rêzik ya ku qafiya pûşandî têde heyî çêbikin û şemaya wê diyarbikin?

## HELBESTA MÎR EHMEDÊ ZENGENE

*Ha Miseran xiyal ha miseran xiyal*
*Xiyal da me wîr, wî dane xiyal*

*Dil bedrim we behr mewc malamal*
*Ber awerd daney cewahir we lal*

*Şikofey çemen şefafey gulan*
*Hem bezm meclis nexmey bulbalan*

*Ye xeylî wext en niyenî diyar*
*Web ê tu textim beyoyext e sor*

*We bê tu omrim nema le Cîhan*
*Text û bext û cam gişt wetorewan*

*Toş wêney cam Cîhan bînenî*
*Rewneq awerdey rûy zemînenî*


*Newaçî mîrzam herfê newat en*
*Bînayî dîdem bê tu zulmaten*

*Pey çi delîlê nekiyanay we lam*
*Wêm û gird kesim her we fidat bam*

DAXUYANÎ

***Wate***: Ey heskiriyê min! Min ewqas bêriya te kiriye ku ez ketime nava kelekela xiyalan. Dilê min ketiye nava deryayê û min çend lib cewahir ji te re peyda kirin û vaye ez wan ji te re pêşkêş dikim. Ey hevraz û hevriyê min, ev demeke ku tû nexuyayî; bê te text û şansê min ji holê radibin û têk diçe. Bêyî te temenê min di nav de diçe. Text û bextê min j imin xeyîdîne. Tû jî wekî cama Cîhan bînî yî û razdarê li ser rûyê erdê yî. Ne bêje ku mîrzayê min qise nekiriye. Bînahiya çavê min, bêyî te tarî ye û tû ji bo çi nehatî ba min? Ez, kes, kar û xizmên xwe qurbana te dibin.

## JÎNAMEYA MÎR EHMEDÊ ZENGENE



Mîr Ehmedê Zengene kurê Îsmaîl begê ye. Li gorî van belgeyên di destê me de, di sala 1689'an de li gundê Qeytolê ji dayîk bûye. Her li wir gihiştiye.

Ji ber ku Ehmed Beg Begzade bûye, di despêkê de, li dibistanê xwendiye û piştî wê bavê wî jêre mamosteyek taybet girtiye. Li gel wî fêrî wêje û zimanê Farisî û Erebî bûye. Ew demekê li Hewreman, Sîne û Bexdayê maye. Piştî wê vegeriyaye herêma xwe. Bi çandiniyê ve xerîk bûye û maldarî kiriye.

Di temenê 68 saliya xwe de yanî di sala 1757'an de koça dawî kiriye. Wêjevanê me yê hêja li gundê xwe tê veşartin.

Dema ku Mîr Ehmed Gulistan û Bostana Sedî Şîrazî xwendiye û pir bala wî kişandiye. Di ciwaniya xwe de, dest bi helbest hûnandinê kiriye. Bala xwe daye li ser helbestên helbestvanên Hewremanî. Gelek helbestên helbestvanên din xistine nav helbestên xwe, bi vî awayî ketiye himbêza afirandinê û gelek helbestên hêja hûnandine.

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

**5.Qafiya Dûrik**

Di vê qafiyê de wekheviya dengên li dawiya rêzika yekem, duwem û çarem ya helbestê pêwîst e yan jî qafiya rêzika yekem û duwem wekhev e. Di her dû rewşa de jî cuda ye.

Ev tê wateya: aaba/ccdc/eefe…

**Mînak:**

Te çav reşê çavên m**ar** = an → redîf
→ a

Biskan berde ser guh**ar** =an redîf
→ a

Te ez kuştim ez helandim → b

Bi awirên ber dîw**ar** = an → redîf
→ a

**Gelêrî**

# 2 Amadeyî Wêje

**LÊKOLÎN**

1.Mîr Ehmedê Zengene kengê û li kûderê ji dayîk bûye?

2.Hûn jî malikek ya helbestên qafiyeya wê dûrik peyda bikin û şemaya wê nîşa bikin.

## HINEK DESPÊK JI WÊJEYA KURDÎ





1. Mînaka yekem ya wêjeya Kurdî ya nivîskî weke tê zanîn helbesta despêkê ya Kurdî beriya mîladê 330'ê ji aliyê Barahoz ve hatiye nivîsandin.

2. Helbestvanê despêkê yê klasîzma wêjeya Kurdî ya demê Îslamê Baba Tahirê Hemedanî  û Elîyê Herîrî ye.

3.Tasawufvanê Kurd yê despêkê Melayê Cizîrî ye.

4.Nivîskarê despêkê yê netewî Ehmedê Xanî ye.

5.Ferhenga despêkê ya wêjeya Kurdî Nûbihara Biçûkan e (ji nivîsîna hmedê Xanî).

6.Rêzimana Kurdî ya despêkê ji aliyê Mela Elî Termoxî ve hatiye nivîsandin (Tesrîf).

7.Yekemîn kesê helbestên coş û xurûşê çêdikin, nivîsandî Feqiyê Teyra ye.

8.Kovara despêk ya ku bi zimanê Kurdî yê latînî hatî nivîsandin kovara Hawar e.

9.Rojnameya despêk ya Kurdan nivîsandî, rojnameya Kurdistan e.

10.Romana despêkê ya Kurdî “Şivanê Kurd” Erebê Şemo ye.

## HELBESTA ŞÊX NUREDÎNÊ BIRÎFKANÎ

Rast û çep tîr dane canî rast û çep
Qews û reştozê kevanî rast û çep

Bê dil û însaf û zalim fitne xîz
Sîne xirbal kir nihanî rast û çep

Ez hal xwî da bûm me dî bê mirwetan
Rête canî min nîşanî rast û çep

Tîr û rim dil ma di navê helqe reng
Min bi ehwalî nezanî rast û çep

## 2 Amadeyî Wêje

Erze dil lew wê dibarit her le ser
Şubhê qetrê asîmanî rast û çep

Xem ji min nehilgirt lew hucetan
Lêk têk bir têne bihanî rast û çep

Lê me her dewrane şubhê  kiljinî
Em le dewra baxabanî rast û çep

Vê cefayê her le nefsa xo diket
Bes yeqîn bêşik nesanî rast û çep

Ez birîndarê kevanê mal helek
Ew zilîxayê zemanî rast û çep

Lê bila fida bit her tenê
Dîlberê bînim dixanî rast û çep


Ehmedê muxtare dilber nurîya
Kamîrat û kamuranî rast û çep

Cergê îtûnî te kir armancê tîr
Şubhetê Şêxê Yemanî rast û çep

DAXUYANÎ

Wate: Ji rast û çep tîr avêtin min, ji navmilan û singa min; wek bêjingê kun kun kirin. Ez ku di rewşa xwe de bûm, ji nişka ve tîr ketin nava giyanê min. Dilê min weke zeviyekê ye û tîr jî weke baranê rijiyane li ser laşê min. Xem û nexweşî destan ji min nakişînin, bi tîran re hevgirtin û li hemberî min rawestiyan. Ez evîndarê vî kevanîme ku yarê ji min re avêt û ew jî zelîxaya serdemê ye. Bila bibe qurbana wê yekê.  Belkî di vê riyê de çavên wê pêbikeve. Ew dîlbera Ehmedê Muxtare, bes ew xweşî, kameranî û bextewerî ye ku cergê germ kir armanca tîrê weke Şêxê Yemanî ku rast û çep.

## JÎNAMEYA  ŞÊX NUREDÎNÊ BIRÎFKANÎ



Navê vî helbestvanî, Nuredîne û kurê Şêx Evdilcebar e. Weke Şêx Nuredînê Birîfkanî tê nasîn. Di sala 1791'an de li gundê Birîfkanê ji dayîk bûye. Birîfkan gundeke ku çend kilometreyan ji bajarê Dihokê dûr e.

Ev wêjevan di zarokatiya xwe de, li cem bavê xwe dixwîne. Quran û hinek pirtûkên din yên olî xwendine. Piştre çûye Hucreya Feqeyan. Ji bo xwendinê piraniya herêmên Kurdistanê

geriyaye. Li Silêmaniyê li cem Şêx Yusuf Efendî xwendina xwe qedandiye.

Li gor agahiyan, malbata Şêxê Birîfkan ji Xelatê çûye Başûrê Kurdistanê. Li Başûr hem waneyên gel hem jî yê Feqê Medresan dane û rê nîşadana rast ya gel pêkaniye. Ji ber van sedeman şêniyên herêmê gelek ji vê malbatê heskirine û vê malbatê jî ne xwestiye wan bişemirînin. Şêx Nuredîn weke yek ji helbestvanê Sofî yê Kurd tê naskirin.

Ji bilî dîwana xwe ya bi helbestên wî yên bi zimanê Kurdî û Erebî hatî dagirtin, çend pirtûkên din jî bi zimanê Erebî li ser rêz û rêçikên Xudanasiyê nivîsandine. Helbestên wî hem olî hem civakî ne.

Ew di sala 1852'an de, gava ku temenê wî 61 bû çûye berdilovaniya Yezdan. Li goristana Birîfkanê hatiye veşartin.

**ZANISTÊN WÊJEYÎ**

Weke di refa yek de jî hatibû diyarkirin, nivîsînên wêjeya Kurd di nav xwe de dibin dû beş.

1.Hûnandî

2. Pexşan

Di vê pirtûkê de emê li ser hûnandî û cûrên hûnandiyan rawestîn.

a.Helbest, cûre nivîsînek herî girîng ya nivîsînên wêjeyî ye. Bes ne di aliyê awêneyê de, di aliyê naverokê de jî ji wêjeya din cuda ye. Hêvî, xiyal û evîn hemû bi helbestê tên ziman.Helbest di nava xwe de dibe heft beş.

1.Helbestên Lîrîk
2.Helbestên Epîk
3.Helbestên Dîdaktîk
4.Helbestên Pastoral
5.Helbestên Satîrîk
6.Helbestên Dramatîk
7.Helbestên Sembolîk

**LÊKOLÎN**

1.Şêx Nuredîn Birîfkanî eslê xwe ji kûderê ye?
2.Malika yekê ya helbesta jor şîrove bikin

## HELBESTA ŞÊX HESENÊ HEKARÎ

Ya rebî dunya hebû tarî
Têde tunebûn mişk û marî
Te zînî kir taze halî
Çi nema gul jî carî

Ya rebî tû hostayî kerîmî
Te vekir dê û tirba tarî
Tû hostayê her tiştî
Bihişt çêkir bi renge bî

Erd û esman tunebûn
Dunya fireh bê binebû
Însan û heywan jî tunebûn
Te xalî saz kir

Di behrê de tenê hebû dur
Nedimeşiya nedimeşiya
Te xweş ruh anî ber
Nûra xalî peyda kir

Goşt û ruh hatine ber
Rona çavan lê hate der
Dest û pê kire leş
Lê şirîn kir gotûbêj

Xudawendê mîr hostayê rehmanî
Rê û dergayî dunyayê vekir
Her tişt j ime re der anî
Bû bihişt erd û avanî

Xudawendê me tiştî dinase
Dora kesê jê kir esase
Jê peyda kir mêrê xase
Got: Eva hê nebes

## JÎNAMEYA ŞÊX HESENÊ HEKARÎ



Şêx Hesen kurê Ebdulberekat e. Nasnavê wî Tacûl Arifîn e. Li gorî pirtûka Simato Emraî di sala 591'ê koçî de li colemêrgê ji dayîk bûye.

Li vir digihe û dixwîne. Ji bo xwendinê li gelek cihan digere. Demekê li Cizîrê û çend salan jî li Mîsul dimîne. Piştî vedigere herêma xwe bavê wî jiyana xwe ji dest dide. Ew dibe cihgirê bavê xwe.

Di sala 644'ê koçî de bi fermana mîrê Musul yê binavê Bedredîn Loiloi tê bidarvekirin. Termê wî li cem bapîrê wî diveşêrin.

Şêx Hesen kesayetek gelek zana û pêşketîbû. Gelek berhemên wî yên li ser zanist, wêje û hwd. hene.

Şêx Hesen di vehûnandina berhemên Kurdî de cihekî wî yê diyar heye.

Berhemên Şêx Hesen:

Sura Aferîna Dinyayê (Sir û raza pêkhatina Cîhanê)

## 2 Amadeyî Wêje

### ZANISTÊN WÊJEYÎ

Dema em temaşeyî helbesta vî wêjevanî ya li jor dikin, têdigihin ka Êzdî bi çi çavî, li pêkhatina sirûşt, xweza û pêkhatina Cîhanê dinêrin

### LÊKOLÎN

1.Şêx Hesenê Hekarî ji kîjan olî ye?

2. Rola olê Ezdiyan di wêjeya Kurdî de çiye? Lêkolîn bikin.

3. Helbestekê li ser olê Ezdîyan peyda bikin.

## HELBESTA KURDÎ

### DIL XEMGÎNE

*Dilhinav birîndar e; dil xemgîne bê te*
*Serê min gêje canê min bê cane, bê te*
*Xewa min bê hişiye bergê min palase*
*Xureka min xûne şadiya min şîne bê te*
*Ji çav işq û ji dil ah û kedere, bê te*
*Tîrê tofane ba û barane bê te*
*Ciyê min sehraye wehşyarim û hevdem*
*Dirk û refş û gewene balgiyê bê te*
*Ji işq û aha sar û awêna dil*
*Cemala zer û reş rengîne bê te*
*Serê min mestûr û singa min cenge dil*
*Xefet yar û meqam nalîne bê te*
*Kebab- dilxûn meyê saqî feraqê te*
*Qedeh çav û me zem esrîne bê te*
*Hinav gulzar û xûn gul baxevan dil*
*Fîxan bibil cefa per jîne bê te*
*Zivistan mêla te peyîz birê min*
*Biharê em ûmûdin havînê bê te*
*Awa ez bûm şah û siltan û welî*
*Ti xwedî can qet najî bê te*

# 2 Amadeyî Wêje

**Peyv:**

**Gewen**: Merşika mû dirêj
**Dirk**: Dirî
**Refş**: tişta ne aheng tê danîn
**Fîxan**: Xurîna bilbil
**Saqî**: Mey ger
**Qedeh**: Şûşe

**Ûmûd**: Hêvî
**Ah**: Maf
**Mestûr**: Nixûmandî
**Meqam**: Cih
**Feraq**: Kovik
**Zem**: avêt
**Cefa**:Jan



## JÎNAMEYA KURDÎ

## (1809-1849)

Navê wî Mistefa Begê kurê Mihemedê Ehmed Begê ji qebîla Sahibqiranê xelkê Silêmaniyê ye. Li sala 1809'ê li Silêmaniyê ji dayîk bûye. Di zarokatiya xwe de, li cem zanyarê bajarê Silêmaniyê hînbûye. Xwesteka wî gelek ji nivîsandina helbestan re hebû. Navê xwe yê hozanvanî daniye "Kurdî", helbestên xwe bi Kurdî, Erebî, Farisî û Tirkî nivîsandîne.

Piştî demekê diçe Sine, Sablax û Tahranê. Li Tahranê bûye mamostayê Eceman. Kurdî diçû civata nivîskaran.

Kurdî hemdemê Nalî ye. Helbestên xwe piranî di derbarê evîndarî û xweşikbûna welat de nivîsandine. Kurdî li sala 1849'ê çûye berdilvaniya Yezdan.

## ZANISTÊN WÊJEYÎ


Qafiye û redîfa malika li jêr diyar bikin
"Dilhinav birîndar e; dil xemgîne bê te
Serê min gêje canê min bê cane bê te
Xewa min bê hişiye bergê min palase
Xureka min xûne şadiya min şîne bê te
Ji çav işq û ji dil ah û keder bê te
Tîrê Tofane ba û barane bê te"

## LÊKOLÎN

1.Kurdî pitirînê helbestên xwe li ser çi nivîsîne?
2. Kurdî kengî û li kûderê ji dayîk bûye?

# BEŞA III

## WÊJEYA CÎHANÊ



Di vê Cîhana em têde jiyan dikin de gelek kesên giranbiha têne dîtin. Ev kesên giranbiha di nava Cîhanê de bi giştî, bi taybetî di nava netewa xwe de jî weke stêrkekê geş dibirqin. Ronahiya wan Cîhanê ronî dike. Ji bilî netewa wan jî mirov ji zanist û wêjeya wan sûd werdigirin.


Di nava gel û netewên rojhelata navîn de jî gelek zanyar, helbestvan, dîroknas, bîrkarînas, stêrknas û doktorên mezin derketine ku hingî dinya hebe, wê navê wan di rûpelên dîroka mirovahiyê de xuya û zindî bimîne. “Ebu Elî sina, Hafizê şîrazî, Seedî Şîrazî, Ferabî, Ibnî esîr û her weke din hindek mînakên ji wan kesên navdar in.

Emê çendek ji van wêjevanên hêja û navnetewî bidin nasîn.

## HELBESTEK JI GULISTANA ŞÎRAZÎ

*Di nava du neyaran de wisan baxive*
*Ger bibin dost tû şermezar nebe*
*Şerê  di navbera du kesan de mîna agire*
*Fesadê bextreş darkêşe.*
*Demê her du alî bi hev şabin*
*Ew di navberê de bextreş û şermezare*
*Di navbera dû kesan de agir hilkirin*
*Ne tiştek raste*
*Xwe di navê de şewitandine*
*Bi axaftina dostan re aram be*
*Daku dijminê xwînxwar guhdarî te neke*
*Tişta tû li ber dîwarî dibêjî şiyar be*
*Da ku li pişt dîwarî guhdar nebe*

## SEEDÊ ŞÎRAZÎ



Seedê Şîrazî li sala 1210 li Şîraza Îranê ji dayîk bûye. Seediyê Şîrazî hem di hêla hûnandin hem pexşanê de nivîskar û zanyarekê Îranî yê navdar e. Ji ber ku zimanê Kurdî û Farisî zimanên biran e, koka her duyan jî Areyanîne.Ji hevdu gelek bandorbûne. Peyvên di jiyana rojane de tên bikaranîn, piraniyên wan weke hevin: weke jimar, navê rojên heftiyê, xwarin û h.w.d.

Rola Ehmedê Xanî di zimanê Kurdî de çawa be, rola Şîrazî jî di zimanê Farisî de wisan e. Şîrazî piştî xwendina xwe ya seretayî qedandî çûye “medresa Nîzamî” ya Bexda, li wê derê perwerdeya xwe temam kiriye û li gelek deverên Cîhanê gerayaye. Mîna Anatolê, Misir, Surye, Delhê, Azerbaycan. Piştre li Nînowa bûye Şêwirmendê Atebegiyan. Lewra li gel zanyariya wî, hişmendiyek mezin jî heye. Piştî demekê xwe dikişîne quncikekê û dikeve xewlê. Lewra ew di hêla baweriya olî de miridê Şêxê Geylanî bû.

Heval û dostên wî, vê rewşa wî napejirînin û wî ji xewlê dertêxin. Êdî dest bi nivîsandinê dike, gelek berhemên wî çêdibin. Ji wan yên pir tên naskirin berhemên wî yên

binavê “Gulistan û Bostan ”e. Ev berhem bi zimanên cuda jî hatine wergerandin. Şîrazî li sala 1291’ê li Îranê çûye ber dilovaniya Yezdan. Gora wî li Şîrazêye.

Berhemên Şîrazî
Gulistan
Bostan
Teqrîrî Dibace
Eql û işq
Nesihet ûl Muluk

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

Seedê Şîrazî, tenê ne wek wêjevan û hozanvanekê Farisî tê naskirin, ji ber ku têkiliyên wî yên bi gelên Rojhilata Navîn re mîna Turkmen, Kurd, Ereb û w.k.d. wek hozanvanekê Rojhilata Navîn tê naskirin.

Ji bo girêdanên xwe yên olî xwestiye têkiliyên xwe ji tevgerên Cîhanê qutbike û xwe bêxe quncikek yê perestgehê. Lê ji ber ku derdorê wî û nasyarên wî yên zanayên Rojhilata Navîn bi hunera wî dizanin û wî ji quncikan derdixin û têxin nava wêjeya Cîhanê.


## LÊKOLÎN

1. Têkiliyên wêjeya Kurdî û Farisî çawa bandor li hev kirine û çima?

2. Ji ber çi Şîrazî xwe kişand quncika xewlê?

3.Rêzika dawiya helbestê ya ku dibêje “Da ku li pişt dîwarî guhdar nebe” şirove bikin.

## FERABÎ



Ebû Nesir Mûhemed Ferabî di sala 870'ê zayînî de, li Feraba herêma Xoresanê ji dayîk bûye. Her çendî jêre Ebû Nesir tê gotin lê di rastiyê de pevjîn nebûye, zarokên wî çênebûne. Hêj di zarokatiya xwe de dest bi xwendina olî û zanista Îslamê kiriye, her wiha bîrkarî û felsefe jî xwendiye û di zimanê Erebî, Farisî, Tirkî û di gelek zimanên din de şareza bûye.

Di sala 921'ê zayînî de çûye Bexda, li wê derê dibin destê mamostayên navdarên demê yên wekî Yûhena Heylan û Îbnî Serac de ziman, mûzîk, bîrkarî û zanistên din xwendiye û ji bo zanistê dest bi geryanê kiriye.

Çend mînak ji gotinên Ferabî: Ferabî di helbestek xweya Erebî de wiha gotiye: "min jiyana xwe li cem dû şûşeyan borand; yek şûşa diwêdê, ya din şûşa şerabê, bi ya yekemîn min hikmet dinivîsî, bi ya duwemîn xemên xwe didan bayê". Carekê ji Ferabî tê pirsîn kîjan ji we di qada felsefê de şarezartire, tû yan Arîsto? Bersiv: "Ger bigihim Arîsto, ezê xwe mezintirîn şagirtiyê wî bibînim. Ferabî li ser mirovbûnê wiha hiziriye: "Ez bi pêşketina mirov û gihandina wî ya kemalê pir bibawerim, kemala mirov

sedemê mezinê bextewariyê ye. Ev kemal û bextewarî jî bi ti awayî pêk nayê, ne bi alîkarî û hevkariya nava gel be.

Alîkarî jî ew e her kes karekê bike ku sûdê yek din jî têde hebe. Eger hevkariya gelê bajarekî di nava xwe de wisa be, wê demê tevayî gelê wî bajêrî wê bextewar û serfiraz bijî.

Ferabî di nijada Ereban de yekemîn fîlozofê olî ye. Bingehê felsefê di nava Îslamê de mirov dikare bêje ji Ferabî despê kiriye. Ferabî di 80'î saliya xwe de, li sala 950'î yê zayînî li Şamê çûye berdilovaniya Yezdan.

Berhemên wî

EL Medînetıl Fazila (Bajarê gihayî)

El Maard el akl (Herîkîna hişmediyê)

El Îhsan –Ul – Ulûm (Başiya zanistê)

Fusus ul Hikmet (Gewhera Felsefê)

Ferabî 117 berhemên xwe li ser zanistên cûr be cûr nivîsandine.

## ZANISTÊN WÊJEYÎ

Dîroka despêkirina Wêjeya Ereban bi awayekî tekûz nayê zanîn lê tê gotin ku nimûneyên helbestên ji beriya Îslamê, di sedsala çaran de hatine dîtin. Ev nimûneyên heyî pêşketinan bi me dide bawerkirin ku helbestên Ereban di qonaxên dûr û dirêj re derbas bûne ta gihiştine asta xwe ya xweşikbûnê. Ev yek jî di mûeleqatan (qesîdan) de tê zanîn. Wê demê mûeleqat di astekê bilind de bû, xwendina wan mûeleqatan li xweşa gelê Ereb diçû, ji ber vê pejirandine, ji ber kirine û bi dîwarê El keebê ve daleqandine.

## 2 Amadeyî Wêje

Wek tê zanîn beriya Îslamê, Ereban helbest û qesîdeyên xwe li şeqama (Ûkaz) û dîwanxaneyan ji xelkê re dixwendin, ev yek dibû boneyek ku dengê van helbestvanan derkeve û xwe bidin nasandin.

Piştî hatina Îslamê her çiqas wêjeya wan hatibe pêşxistin jî û Hatibe xwestin ku têkîliyan bi netewên din re pêşbikevin, lê netewperestiya di nav wan de nehat helandin; berevajî di demê Emewiyan de netewperestî giha asta xwe ya herî bilind. Li gel ewqas şoventiya desthilatên Ereb, gelek kesên giran biha jî derketine. Mînak: Ferabî; her çi qas ji netewa Erebaye jî lê dibêje: “Ger bigihim Arîsto, ezê xwe mezintirîn şagirtiyê wî bibînim.”

**LÊKOLÎN**

1. Ferabî di helbesta xwe ya Erebî de çi gotiye?
2. Asta Ferabî di qada felsefê de çawa ye?


Derya Res
Gurcistan
Rusya
Ermenistan
Azerbeycan
Nahcevan
Tirkiye
KURDISTAN
Iran
Derya Sipi
Suriye
Lubnan
Iraq
Idir
Qers
Sewas
Erzincan
Erzerom
Agri
Bazid
Mako
Caldiran
Dersim
Cewlik
Eleziz
Mus
Tetwan
Behra Wane
Wan
Qotur
Xoy
Elbistan
Meleti
Farqin
Bitlis
Basqale
Firat
Semsur
AMED
Batman
Sert
Gever
Meras
Siverek
Merdin
Sirnex
Clemerg
Urmiye
Besni
Zaxo
Nisebin
Cizir
Entap
Riha
Verangsehir
Nexede
Iskenderun
Qamislo
Dicle
Dihok
Mihabad
Hasakeh
Musil
Bokan
Hewler
Seqiz
Bicar
Kerkuk
Silemani
Merivan
Sine
Helebce
Qesri-Sirin
Kirmansah
Xaniqen
Ilam